


Rojnameger  
ê Îngiliz  
Nick Brain:

**B**erê min PKK jî wekî IRA'yê dizanî, tiştên ku min xwendine min wisa dizanibû ku IRA biçûktir e ji PKK'ê. Lê dîsa jî min texmîn nedikir ku piştgiriya gel a ji bo PKK'ê ev qas pir e. Li Îngilistanê PKK wekî rêxistineke biçûk tê nîşandayîn, lê tiştên ku min dîtî vê ramanê pûç dikin. Min dît ku bi taybetî li Kurdistanê piraniya gel piştevaniya PKK'ê dike.

Sûper Walî bi min teyb da girtin ji min re got: "Ji HA-DEP'ê bigire heta bigihîje IHD'ê gelek rêxistin cudaxwaz in." Li gorî dîtina rayedarên tirk hemû rêxistinên wekî IHD, HADEP û rêxistinên ku daxwazên ne radîkal jî cudaxwaz in.

Rûpel 8-9



● **'Paketên aborî kêşeya kurdî çareser nakin' di vê nûçeya lêpirsînî de gelek kesan dîtî û ramanên xwe anîn ziman.** Rûpel 3

● **DILDAR ŞEKO li ser salvegara şehîdkirina Qazî Mihemed bi sernavê**

**"Roj baş Mehabad" pexşanek nivîsî** Rûpel 10

● **QELEMŞOR bi sernavê "Asena neke van gotinên erzan", gotinên "Şalyara Navxweyî" ên der barê Abdullah Öcalan de dide ber şûrê xwe.** Rûpel 14



NAVEROK



4

Î. Culemêrgî: Serhildanên Nehriyan



6

Murat Kaya: Wêneyên şehîdan ji me re dixivin



7

Sevda Eldemir: Hunermendek ji Serê Kaniya binxetê

Ji Xwendevanan

BI saya rojnameya me Azadiya Welat, ez ji tevî gelek kesan hînî xwendin û nivîsîna zimanê xwe bûm. Lê ma bes e gelo? Na ne bes e! Pêwîst e her xwendevanek wekî xebatkarekî bişixule. Hûn jî, em jî em hemû vê yekê dixwazin. Rojnameyek (hemû cûre weşan) bi alîkariya xwendevanên xwe li ser piyan radiweste. Pêwîst e em vî zimanê ku bûye kelemê çavên neyaran, ji mirinê xelas bikin. Çimkî em hemû dizanin ku neteweyek bi yekîtiya zimanê xwe netewe ye, ji bo netewebûnê mercê herî girîng ziman e.

Rexneyekê min li zanyar û rewşenbiran heye, hê jî bi kurdî napeyivin, an jî naxwazîna bipeyivin. Em hemû dizanin ku dema însanek (bi taybetî jî musulmanek) gemarî dibe, qirêj digire an îblîs pê dikene, hema radibin serê xwe dişon. Lê sed mixabin ku zimanê rewşenbirên me gemarî bûye, lê ew wî naşon. Hêviya min ev e ku ew vê şîreta min bigirin û bi zûtirîn wext, zimanê xwe bişon.

Di dawiyê de ez dixwazim çend tiştan li ser kêmasiyeke rojnameyê jî bibêjim. Dema hûn peyvan dinivîsin bi awayekî rast binivîsin. Bi taybetî jî di nivîsandina peyven nû de gelekî hesas bin. Çimkî dema hûn wan çewt binivîsin, wisa bizanin ku em xwendevanên we jî wan peyvan çewt ji ber dikin û hîn dibin. Hin caran ji ber ketina an jî bi hev biguherîna îtipan, peyvek çewt derdikeve. Hay ji vê yekê hebin.

REMZÎ QALXANLI



Li ser pîroznameyên Newrozê

SAMÎ TAN

Ji bo pîrozkirina Newroza xebatkarên rojnameyê gelek name û kart hatin ji me re, wekî me berê jî gotibû, em spasîyên xwe pêşkêşî wan dikin û Newroza wan ji dil û can pîroz dikin. Di nav wan kartan de çend heb bi hinek aliyên xwe balkêş bûn.

Yek ji van kartan ji dostên me yên japon Taniyon û Eiko hatibû. Bi nasîna wan her du dostan, em pê hesiyan ku dengê kurdan gihîştîye wî welatî dîr jî û li wir jî gelek dostên gelê kurd çêbûne. Her wiha wan ji me re wergera japonî ya pirtûka Mamoste Beşikçi "Metingeha navdewletî Kurdistan" jî anîbû.

Taniyon rojnameger e. Wî bi xwe li ser kurdan gelek nivîs nivîsîne û bernameyên televîzyonê amade kirine. Van hevalan-î biniya nivîsa xwe bi kurdî "Newroz pîroz bê" nivîsîne û li nik wê jî sê xetên kesk û sor û zer çêkirine.

Hinek kartên ku ji me re hatin ji girtiyên azadiyê bûn. Di nav wan de bi taybetî karta mebûsên kurd Hatip Dicle, Leyla Zana, Selim Sadak û Orhan Doğan em gelekî kêfxweş kirin. Em bi dil û can

beşdarî hêviya wan a ji bo aştî, azadî û serfiraziyê dibin û spasîyên xwe pêşkêşî wan dikin. Dîsa nameya zarokê kurd î deh salî Lezgîn Demirci ku bi xwe hînî xwendin û nivîsîna kurdî bûye, em gelekî kêfxweş kirin.

Nameyeke din ku ez dixwazim li serê rawestim ji Girtîgeha Antakyayê hatiye. Hevalê hêja Şivan Tuşak bi germahiya nameya xwe dilê me geş kir. Di vê nameyê de tiştêkî din î balkêş heye. Name bi tirkî hatiye nivîsîn. Lê em ji naveroka nameyê hîn dibin ku heval Şivan bi qasî me dildarê zimanê xwe ye zikmakî ye û xwestiye bi kurdî binivîse.

Di nameyê de hatiye gotin ku wî xwestiye bi riya APS'yê ji me re anketa rojnameyê bişîne, lê ji ber ku bi kurdî bûye, îdareya girtîgehê dest daniye ser wê. Heval daye zanîn ku ew bi vê kirinê gelek êşiyaye û gotiye: "Ez çî bikim, em di destê dijmin de ne..." Li hemberî vê yekê kesên ku name kontrol kirine, li biniya mora "hatiye dîtin" nivîsîne: "Em kesî wekî dijmin nabînin."

Gelekî baş e, heke rayedarên girtîgehê

bi çavên dijminan li girtiyan nenihêrin. Lê mixabin, prêzeya wan vê baweriyê nade mirov. Bi dehan girtiyan ku hate îro hatine kuştin, vê gotinê derew derdixin. Li aliyê din ger bi çavê dijimîniyê li kesî nanihêrin, ji bo çî nahêlin ku ew bi zimanê xwe yê zikmakî nameyekê binivîsin? Çima zimanê tirkî li ser wan dikin ferz?

Em dizanin ku rayedarên girtîgehê vî tiştî bi serê xwe nakin. Ew kirin encama polîtîkayên dewletê ye. Xwediyên van polîtîkayan hem qala wekhevîyê dikin, hem jî ji zêdebûna nifûsa kurdan ditirsin. Mafê kurdên nadin tu kesî, heke yek ji bo doza kurdî şer bike jî, wekî 'ermen' tê binavkirin. Peyva kurd datînin ber navê endamên mafyayê yên wekî "Kürt İdris".

Kurdên li Ewrûpayê jî nikarin xwe ji tirkbûnê xelas bikin. Heftiya çûyî mala du malbatên kurd hate şewitandin. Çapemeniya tirk ew wekî tirk bi nav kirin. Dewleta tirk jî dixwaze kuştina mirovên kurd ji xwe re bike mifteya deriyê Yekîtiya Ewrûpayê û hinceta veşartîna sûcên xwe yên li dijî gelê kurd. Li vir divê ez bidim zanîn ku pêkhatina van bûyeran di vê demê de wekî tesadûf xuya nake û bêhna kontrayên tirk jî jê tê.

Wekî encam em lanetê li kujeran dibarînin û dibêjin bila serê malîyên wan û gelê kurd sax be.

Dî dîrokê de şerê çînayetî

Î. HALİL KOŞAR

Pêşkeftinên civakê, ançax bi şerê çînayetî çêdibe. Şerên çînayetî ji bo çareserkirina nakokiyên hilberinê navgîneke konevanî ye. Çîn, di nav civakê de, di dîrokê de her tim cihekî girîng digire. Ji ber vê yekê marksîzm, dîrokê bi vî awayî rave dike: "Dîrok, bi tevayî, şerê navbera çînan e." Tu li kîjan çerxê, tu li kîjan demê dimeyzi, her tim du çînan hebûna xwe domandinê. Yek ji wan çîna serdest e, ya din jî çîna bindest e. Di dema me de jî ev şer bûye şerê burjûwazî û şerê çîna karkeran. Marks û Engels, cara yekemîn şerê çînî li ser bingeheke rast û îlmî dane rûniştandin, zagonên wî afirandin û ev zagon derbasî jiyane kirin.

Şerê çînayetî berî Marks jî hebû. Ew ne wekî hinek qelemşorên burjûwazî îdia dikin dîtineke "bêyom" ya Marks e. Şerê çînayetî li derveyî vîn û daxwaza mirov heye û tê meşandin. Di çerxa diduyan de, şerê çînayetî pir xurt hatiye meşandin. Koleyên li hemberî desthilatdariya xwediyê xwe şerekî giran û dîrokî meşandin. Di vê çerxê de derketina Spartakus, berî her tiştî şoreşek e û derketineke dîrokî ye. Ji ber ku Spartakus, cara pêşîn li hemberî koledaran berxwedaneke xurt û şerekî çînayetî daye meşandin.

Di şoreşa Fransayê de jî şer di navbera burjûwa û feodalên de derbas bûye. Ev şoreş jî bi awayekî din ji gel re bûye nimûne. Ev şer di bin ala "wekhevî, bi-

Şerê çînî di rastiya xwe de şerê desthilatîyê ye jî. Ji ber vê yekê jî her çîn dixwaze ramanên xwe, bîrdoziya xwe bîne ser kar. Karker û xwediyên bîrdoziya sosyalîst, bi saya şerê çînî xwe perwerde dikin.

ratî û azadiyê" de derketibû. Ew şoreş jî gelên belengaz û çînen bindest re bûbû minak.

Di Şoreşa Oktoberê de jî bi rêberiya Lenîn, şerê çînayetî gihîştîye merheleyeke din. Lenîn jî bi her awayî li hemberî burjûwayên biçûk, li hemberî Çar, li hemberî ekonomîstan û li hemberî Ne-rodnîkan (anarşîstan) şerekî zanistî meşandiye. Li Rûsyayê Partiya Bolşevîk, bi rêberiya Lenîn li hemberî burjûwayên biçûk her tim bi awayekî zanistî şerê xwe bêrawestan meşandiye. Lenîn, gotina Engels ku ji bo burjûwaziyên biçûk aniye zimên, xweş aniye cih. Engels di dema şoreşê de ji bo burjûwaziyên biçûk wiha dibêje: "Dema ku ew bi te re meşîyan, tu jî bi wan re bimeşe, lê dema ku ew rawestîyan, berê xwe bide wan û bi wan re şer bike."

Tevgera Azadiya Kurdistanê jî ji hemû şoreşan, deman û bi taybetî jî ji dîroka Kurdistanê gelek ders û tecrûbe derxistiye. Li gorî van tecrûbeyên xwe riyeke rast û têkoşîneke xurt li hemberî çînen din, hêzên kevneperst û nêrînen çewt di-de meşandin. Di Kurdistanê de ji her çîne mirov derbasî nava refên şoreşê dibin. Ev kes nêrînen xwe, jiyana xwe, rabûn û rûniştina xwe bi xwe re tînin nava tevge-

rê. Li hemberî van di bin rêveberiya serokatiyê de, bi awayekî zanistî şerekî pir germ tê meşandin û giranî bêhtir li ser vî şerê di nav xwe de ye.


Di nava Tevgera Azadiyê de jî burjûwayên biçûk nêrînen xwe, bîr û ramanên xwe bi awayekî rêxistinî dijînin. Li hemberî pêşketinên partiye dibin asteng û aloziyan çêdikin. Serok ji bo burjûwayên biçûk û bîrdoza wan wiha dibêje: "Hûn dixwazin rojekê zûtir daxwazên çînen xwe pêk binin. Hûn dixwazin zû bibin serdest û bêked û bêxebat bibin xwediyê desthilatîyê" Ev jî taybetiya burjûwayên biçûk e.

Heger li hemberî van çînan şer nehatibûya kirin, wê têkoşîn ev qas xurt û geş nebûya. Şerê çînî di rastiya xwe de şerê desthilatîyê ye jî. Ji ber vê yekê jî her çîn dixwaze ramanên xwe, bîrdoziya xwe bîne ser kar. Karker û xwediyên bîrdoziya sosyalîst, bi saya şerê çînî xwe perwerde dikin. Serokatî ji bo vê yekê wiha dibêje: "Ez hemû hêza xwe di nav rêxistinê de, ji şerê çînî distînim." Mirovê ku metoda wî şerî, zagonên wî, bi şiklekî zanistî hîn bibe û bide meşandin, wê her serkeftin para wî mirovî be. Bi rêberiya çînen gel, divê mirov şerekî şoreşgerî bimeşîne.





Di navbera 28-31'ê meha adara 1997'an de li Stocholmê li ser zaravayê kurmanckî (kirdkî, dimilkî, zazakî) civînek li dar ket. Civîn bi beşdariya 18 kesî, ku di wî warî de xebatê dikin, pêk hat. Di civînê de kesên wekî Cemil Gündoğan, Haydar Diljen, J. Espar, Kamer Söylemez, Lerzan Jandil, Malmisanij, Munzur Çem, Robîn Rewşen cih girtin. Di rojêva civînê de ev mijar hebûn: Civîna çûyî, binavkirina zaravayê, navê mehan, hejmar, navê bajarên Kurdistanê, cînavkên kesîn, cînavkên nişankirinê. Meylên ku di civînê de hatin destnîşankirin dê wekî namilkekê (broşûr) bê weşandin. Ev civîn tê berdewam bikin.



Li gorî daxuyaniya pîreka girtiyê PKK'yî Mehmet Şirin Önen, yê ku ji Girtîgeha Îskenderûnê firar kiribû, da zanîn ku mêrê wê piştî ku bi saxî hatiye girtin bi îşkenceyê hatiye kuştin. Pîreka Önen, Halime Önen diyar dike ku, li ser laşê wî şopên îşkenceyê hebûne, guhên wî hatine jêkirin û çermê rûyê wî hatiye gurandin. Her wiha li ser laşê wî şopên bêrikan jî tunebûne û bi dipçikan kortik hatiye vekirin. Rayedarên dewleta tirk, ji bo jêbûna guhan diyar-kirîne ku, ji ber ku ketiye guhên wî parçe parçe bûne. Wekî tê zanîn, rayedarên dewleta tirk diyar kiribûn ku Mehmet Şirin Önen di 14'ê adara 1997'an de di şerekî de hatiye kuştin.

## NÛÇE

# Paketên aborî kêşeya kurdî

## Çareser nakin

### Mebûsê RP'ê Mehmet Fuat Fırat: RP ji bo me ehven-î şer e

Li ser paketa dawîn yê derbarê Başûrê Rojhilat de kir, hûn çi difikirin?

● Ev paket di warê aborî de hemû cureyên alîkariyê dîhundurîne! Wekî alîkariya aborî tê diyarkirin ku wê karxane (fabrika) bêne avakirin û nizamî çî! Lê di warê mafên kulturî de di paketê de bi yekcarî tiştek nîn e.

Li ser naveroka paketê di nav partiya we de lihevnekirinek heye?

● Ku hebe ma wê çî bibe! Tu kes pûte bi mebûsên kurd nake. Ji xwe Xwedê jî carekê bela kurdan daye!

Wê çî bibe... Ku em bibêjin me tiştek kir, wê bi guhên me bigirin û me bihavêjin derve. Ma emê karibin çî bikin?! Ji her alî ve û li her derê em têkçûyî ne. Ji bilî xemgînbûnê emê nikaribin tiştekî bikin. Bi tenê dilê me bi vê yekê diêşe. Em bi awayekî belengaz û stûxwar li pey wan dimeşin...

Gelo hûnê wekî mebûsên kurd karibin ji Partiya Refahê veqetin?

● Na, veqetîna çî! Ku em jê veqetin wê çî bibe? Partiyên din xerabtir û kambaxtir in; DYP ji wê kambaxtir e; hemû qatîl di nav DYP'ê de li hev kom bûne! ANAP ji aliyê kesên MHP'yî ve hatiye bidest-xistin! Rewşa Ecevit diyar e! CHP jî bêîman û bêdîn e, tu tiştî wan nîn e! Bi tenê di nav CHP'ê de 3-4 kesên baş hene. Lê bi 3-4 kesan tu tişt naçe serî.

Ku tirs û zordariya hêzên leşkerî tunebe, Partiya Refahê bi tena (însiyatîf) xwe ji bo çareserkirina kêşeya kurd wê têrê bike?

● Belê, ji sedî sed RP bi tena xwe ji bo çareserîya kêşeya kurd têrê dike! Medya û hin sazî, ji ber ku RP xwedî nasnameyêke îslamî ye bi çavekî dijminatî û dudilî li RP'ê dinêrin. Her wisa ku RP kêşeya kurd jî hilde destên xwe nema dikare ji bin rabe. Heger RP bi tena xwe karibe bibe iqtîdar wê demê dibe ku karibe mafê kurdan ê çandî bide. Wekî din ne mimkûn e. Ger ku felsefeya îslamê bê fêmkirin, ev kêşe bi hêsanî çareser dibe.

Tiştêkî ku hûn lê zêde bikin heye?

● Belê, heke mirov di karekî de li gorî daxwazê bi şer nekeve, divê ya kêm xirab bê hilbijartin. Îro, rewşa mebûsên kurd yê di nav RP de wiha ye. RP ji bo me ehven-î şer e. Dibe ku di rojên pêşîya me de baştir be.

**Partiya Refahê jî wekî partiyên berî xwe dest avêt paketeke "aborî". Lê derdorên îslamî jî di nav de kes bawerîya xwe bi vê paketê nayîne. Bawerîya giştî ev e ku bêyî hin gavên siyasî kêşaya kurdî çareser nabe.**



**R**ayedarên Partiya Refahê di civîna MGK'ya di 31 adarê 1997'an de, bi navê "Li Rojhilat û Rojhilatê Başûr Hewldaneke Pêşvebirinê" paktek pêşkêşî MGK'ê kir û paket ji layê MGK ve hate pejirandin.

Erbakan li ser paketê civîneke çapemeniyê çekir û pesnê wê da. Lê tê gotin ku di vê paketê de jî ji bilî hin wadên aborî tiştek nîn e. Ferqa wê ji yê din, daxwaza vekirina dibistanên Îmam Hatip in.

Li ser paketa navbirî ya Partiya Refahê û nêzîktêdayîna wê bo kêşeya kurdî, me dîtînen mebûsê Refahê yê Erziromê M. Fuat Fırat, Serokê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan Akın Birdal, Berpirsê Karê Nivîsaran yê kovara Nûbiharê Süleyman Çelik û Berpirsê Karê Nivîsaran yê Rojnameya Selam Mehmet Emin standin.

Mebûsê Partiya Refahê yê Erzeromê Mehmet Fuat Fırat, pirsên me bi awayekî dilşkestî, bêhêvî û neçar bersivandin û ji bersiva pirsan bêhtir xem û dîtînen xwe anîn zimên. Fırat da zanîn di paketa dawî de ji bo mafê çandî yê kurdan tu tişt nîn e. Her wiha

bêhêvîbûna xwe bi van gotinan daxuyand: "Ger em bixwazin tiştêkî bikin wê bi guhên me bigirin û me bihavêjin derve." Li gorî Fırat hemû qetîl di nav DYP'ê de kom bûne.

Serokê Komela Mafên Mirovan Akın Birdal jî bal kişand ser mafên çandeyî û demokratîk û got: "Di warê mafên mirovan de heger gav neyên avêtin, kêşeya kurd bi guhertinên aborî çareser nabe." Serokê IHD'ê Birdal ev paket wekî hewla xapandina raya giştî bi nav kir û da zanîn ku pêşketina aborî jî girêdayî pêşketina demokratîk e.

Akın Birdal da xuyakirin ku ji bo çareserkirina kêşeyan, cesaret û biryardarî pêwîst e. Lê di nav RP'ê de ev biryardarî û lihevkerî tune.

Berpirsiyarê Nivîsaran yê Nûbiharê Süleyman Çevik jî da zanîn ku Refah nikare tiştêkî esasî bike. Li gorî Çevik, RP li cihê ku artêş û rayedarên rejîmê ji wan re tiştêkî nabêjin xwe tûj dikin. Lê li cihê ku rayedar diranên xwe nişanî wan didin milûs dibin.

Nivîskarê Kovara Nûbiharê S.Çevik, li ser nêzîktêdayîna RP

ya li hemberî kêşaya kurd jî ev nirxandin kir: "Tevî ku di nav RP'ê de mirovên baş hene jî, lê gotinên wan pere nakin." Çevik diyar kir ku Refah bi riya nasnameya xwe ya îslamî dikare bi awayekî hêsantir kurdan bixapîne.

Berpirsiyarê Nivîsaran yê Rojnameya Selamê Mehmet Emin jî, paket wekî hewldaneke pûç û nejidil bi nav kir û da zanîn ku ew ji bo bicihanîna paketê jî ne hêvîdar e. Emin wiha axivî: "Divê kêşeya kurd awayekî demokratîk bê çareserkirin. Ev tişt ji layê gelê herêmê ve jî nejidil tê dîtînen. Rast e, gelê herêmê gelekî xizan e. Lê ji bo ku gel dev ji mafên xwe yê din berde divê paketên wisa wekî bertîl neyêne bikaranîn."

Berpirsiyarê Selam Mehmet Emin, da zanîn ku li ser kêşeya kurd, di navbera gotinên Erbakan yê berê û niha de cudahiyeke berbiçav heye. Her wiha digel ku di nav RP'ê de mirovên baş hene, kes û komên mîlîtarîst ku dewletê jî gel û mirovan mezin û hêjartir dibînin ne hindik in.

MAZLUM DOĞAN



# Serhildanên Nehriyan

**Di sala 1880'yî de li wê sêgoşeyê hem ji aliyê olî, hem jî ji aliyê çandî, aborî û siyasî ve, hêza herî balkêş ew bû. Hejmara bajarokê şîrîn Nehriyê digihîşte deh hezarî. Gelek kelat û qesrên bi nav û deng hatibûne avakirin tê de. Binemal, xwediyê 130 gundan bû.**

Devera Mukriya, Hekarya, Behdînan ku bi giştî jê re herêma Botan tê gotin, navenda Kurdistanê ye û şûnwarekî pir kevna e. Ev herêm di hemû demên dîrokê de ji gelê kurd re bûye hêlîn. Ew hejand, mêjand, mezin kir, rapêça, raşidand û şand deştên mezopamyayê. Dema westiyên jî, serê wan êş girt jî dîsa zivirîne wê hêlînê. Dijminên gelê kurd di qimên 19 û 20'an de destê xwe dirêjî wê dergûşê jî kirin. Di wê landikê de balifeke bi nexşên herî kevn xemilandî jî bajarokê Nehrî bû. Dîroka wê dirêj dibe, çaxê pêşîn. Dibe ku wê navê xwe ji Naîriyên pîsman û hevalbendên ûrtartuyan standibe.


Di nîveka qimê 20'an de mîrekên kurd ên kêleka Zagrosan bi ber destê împaratoriya Osmanî û Îraniyan ketin û hatin hilweşandin. Di 1865'an de binemala Erdelaniyan jî holê rabû. Ji bo gelê kurd qonaxeke nû dest pê kir. Pêşeng û rêveberên sedsalan jî holê rabûn. Valatiya bêseriyê ji aliyê mêtîngehan ve nedihat dagirtin. Pezê bêser li hin şivanên nû digeriya. Serokên eşîran mezinahiya hev û du nedipejirandin. Terîqetên Qadirî û neqşibendî tevnên xwe di nav çiyayên serbilind de jî raçandibûn. Gel berê xwe zivirandê wan. Jixwe çî dema ku di nav gelan de rêkên siyasî bixetimin, gel berê xwe dide rêkên olî. Derwêş û sofî di demeke kurt de bûne xudanê tekyeyên dewlemend û murşîdê gelê kurd.

Binemalek ji wan jî mala Nehriyan bû. Beriyan wan mîrekên Xumarûyê mezinahî li devera Navşarê (Şemîzdîna) dikir. Rabûna mîrekên mezin dawîya wan

jî anî. Piştî gelek şerên dijwar, şêxên Nêhriyê bûne hakimên deverê. Wan xwe wekî seyîd û neviyên şêx Ebdulqadirê Geylanî didan naskirin. Ji derve ketibûn deverê.

Di sala 1880'yî de li wê sêgoşeyê hem ji aliyê olî, hem jî ji aliyê çandî, aborî û siyasî ve, hêza herî balkêş ew bû. Hejmara bajarokê Nehriyê digihîşte deh hezarî. Gelek kelat û qesrên bi nav û deng hatibûne avakirin tê de. Binemal, xwediyê 130 gundan bû. Dirav, bac û keda Geverê, Mêrgeverê, Şîno, Lolan, Mêrgesorê gişt diherikî ber bi dergêhen qesrên nehriyê ve. Şêlandin, dizî, talan û bêbextî nemabû. Hejmara xwendevan û mirovên zana zêde bûbû. Pirtûkên ku li Stenbol, Qahîre, Şam û Bexdayê dihatin çapkirin, di du sê mehan de digihîştin pirtûkxaneyên qesrên Nehriyê û derabeyên dîwarên wê dixemilandin.

Di nîva qimê 19'an de giraniya Seyid Taha di nav tuxubê her du împaratoriyan de xuya bû û nav û dengê wî belav bû. Kurê wî Seyid Ubeydullah, di şerê navbera osmanî û oûsan 1877-78'an de li nik osmaniyan cih girt û ji bo cengê gaziya cihadê li kurdan kir. Li gorî nivîsîna Garo Sasûnî 50, li gorî Xalfîn jî hezar kurd beşdarî wî şerî bûbûn. Di çavkaniyên biyan de xuya dibe ku Şêx Ubeydullah daxwaza Kurdistaneke serbixwe di-



Kavilê qesreke Nehriyan a bi navê Qesra Qayme ku li derdora Navşarê ye.

kir ku navenda wê bajarê Mûsilê be. Hem ji rûsan, hem jî ji îngilîzan alîkarî xwest. Lê herduyan jî bersiveke dirust nedanê.

Di sala 1880'yî de çû hecê. Piştî zivirî ligel eşîrên kurd ên deverê civînek çêkir. Hin nivîskarên biyan dibêjin ku rêveberên 225 eşîrên kurd ketibûn wê civînê. "Ji wan 5 jê şêx, 21 xelîfe, 68 beg û 42 jî prens bûn." (Halîfîn- 108)

Di wê kombûnê de biryara serhildanê hat standin. Di deverê de hejmareke girîng ya ermenî û asûriyan jî hebû. Wan jî daxwaza hin mafan dikir. Emperyalîstên li gorî berjewendiyên rojane car car tagiriya (alîgiriya) wan dikirin û dema împaratoriya Osmaniya ber bi hilweşîna diçû, wê carê jî ji wê re bijîşkî dikirin. "Sultanê Osmani xwest ku wî kiş bike ser ermeniyan. Bes şêx nehate wê lîstikê. "Bab-î Alî niha bi dev piştevanê kurdan e, lê armanca wî ew e ku ne li hemberî

berxwedanê kirin osmanî. Lê di demeke kurt de xeyalên osmaniyan jî şkestin. Pêşveçûn û belavbûna tevgera şêxê nehriyê ew jî tirsandin. Rûsan jî xwe nerazî kir. Osmaniyan li devera bajarê Wanê pişt li hêzên bizavê birî, leşkerê xwe û baregahên xwe xurt kirin. Di devera Tebrêzê de sistahî çêbû. Hin eşîrên kurdan xiyaret kirin û xwe dane aliyê dijmin. Hêzên şoreşê têk çûn. Li ser kurdan tevkujiyê dîsa dest pê kir û bi sedan gundan kurdan wêran û kambax bûn. Hin çekdarên kurd xwe dane devera çiya û berxwedan berdeham kirin. Şêx Ubeydullah teslîm bû û ew birin Stenbolê. Di wê navberê de jî dîsa biyanan alîkarî xwest. Bes kesekî destê wî negirt. Di 1882'yan de, bi nehênî zivirî Kurdistanê. Li ser hin bizavên wî yê nû Sultan Ebdulhemîd ew surgun kire bajarê Mekkeyê.

Tevgera din ya neteweyî têk çû. Renî hem ji aliyê rojhilat, hem jî ji aliyê rojava ve hate wan. Wan nikaribû jî berêrîşên her du kedxwaran xelas bibin û di birceke bêdergeh û bêkulek de mabûn asê. Kesekî destê alîkariyê ji wan re dirêj nekir û di nav tarîtiyê de fetîsîn. Di vê xendikînê de wekî di hemû serhildanên kurdan de çêbûyî, xayin û xwefroşên kurd jî roleke girîng lîstin û hêz dane neyarên kurd û Kurdistanê.

Kurê şêx Ubeydullah, Seyid Ebdulqadir û neviyê wî Seyid Mehemed jî di dema bûyera Şêx Seid Efendî de li Amêdê, li ber dergêhê Mizgefta Mezin hatin darvekirin. Neviyekî wan ê din Seyid Musluh jî, di sala 1933'an de navçeya Navşarê (Şemîzdîna) dagîr kir û hin zivanên leşkerî dane komara tirk a nû.

Nêhrî 10 km. li başûrê Navşarê di nav geliyekî kûr de ye. Îro jî çend xaniyên cerdevanan pêvetir kesek tê de nîn e. Di bajarokê wêran ên bi paş de ji me re diyarî ma, tenê hin dîwarên qesrên xerabe û ximên hin avahiyan in.



Ji dimenek jî Qesra Kelat ku ew jî li derdora Navşarê ye û êdî kavil bûye.

gelên ku ne musulman in, tevgerê bi me bide kirin. Dema ermenî ji holê rabûn wê çaxê em dê bibin hedef."

Kurdan di payîza 1880'yî de ji aliyê Kurdistana Rojhilat ve dest bi serhildanê kir. Gelek eşîrên kurdan hatibûn rex hev. Li gorî gotina hin nivîskarên, 50 hezar leşker civiyabûn. Bajarê Êrmiyê zû standin û ber bi bakur aliyê Tebrêzê ve meşîyan. Li ermenî û asûriyan alayên şîn belav kirin ku bînan naskirin û ziyana li wan neyê kirin. Îraniyan pêşiyê sedemê wê



# Dahûrîna peyvvan (12)

T evî vê xebatê, wekî ku ji ser nav jî dixuye, dibe dozdeh xebatên li ser dahûrîna peyvên hevedudanî. Di encama van xebatan de ez gihyam vê ramanê: Di zimanê me de peyvên hevedudanî gelek in. Her wiha, ligel peyvên ku teşe û şeweyên xwe û wateyên xwe yên rastîn hêvişandine, yên nehêvişandine jî hene.

Piştî vê nivîsê ez dê demekê navberê bidim vê cure xebatê û ez dê li ser mijarên din hinekî serê xwe biêşînim.

**berbûk:** Peyva ne xwerû ye, hevedudanî ye. Mirov pergîni awayên wê yên fena *berbûk*, *berbû*, *berbî*, *berbûrî* û *berbûyî* jî tê. Ev peyv ji pêrkîta (pêşgira) */ber/*, ji navdêra */bû/* û ji parkîta (paşgira) */k/yê* çêbûye: *ber+bû+k*. Li vir, tiştên ku li ser her du qertafan (ber û k) hate gotin êşkere û zelal e. Divê ku em li ser navdêra */bû/yê* hinek rawestînin.

Peyva */bû/* di wateya dîlan û dawetê de ye. Ez ne şaş bim, bi qasî ku di bîra min de maye, li Pêrtexa Dêrsimê jî dawetê re */bû/* dibêjin. Jixwe ji peyvên mîna *berbû*, *berbî*, *berbûrî* û *berbûyî* tê fêmkirin ku bi alikariya pêrkîta */ber/* ji peyva */bû/yê* peyveke nû hatiye çêkirin. Ji kesên ku li pêşiyê diçine mala bavê bûkê û haziriya bûkê dikin re, *berbû* ango *berbûyî* tê gotin.

Me divê ku em navdêra */bûk/* jî hildîne dest xwe. Ev peyv jî, bi alikariya parkîta */k/yê*, ji */bû/yê* peyveke nû hatiye çêkirin: *bû+k*

**bacenax:** Ev peyv, ku mîna *becenax*,

*bacnax* û *bacanaq* jî tê bilêvkirin, ji du hêmanan çêbûye: *baca+nak*. Di kurmancî de digel vê peyvê peyvên wekî *hevçeng*, *hev-bûk* û *hevling* jî tên bikaranîn. Gelek kes difikirin ku ev navdêr bi tirkî ye û zêdeguh nadine wê. Lê tu eleqeya wê bi tirkî nîn e. Çawa ku guh bi gelek peyvên me yên ku ketine zimanê tirkî nakin.

Tirkolog bi xwe diyar dikin ku ev peyva hanê bi farisî ye û ji */baça/* û */nak/* pêk hatiye; yek ji wan tirkologan jî Gerhard Doerfer e. Em bi bîr bixin ku di zimanê tirkî de navê xwarina "serûpiyan" jî "kelepa-

**B acenax, ku mîna becenax, bacnax û bacanaq jî tê bilêvkirin, ji du hêmanan çêbûye: baca+nak. Di kurmancî de digel vê peyvên wekî hevçeng, hevbûk û hevling jî tê bikaranîn. Gelek kes difikirin ku evnavdêr bi tirkî ye û guh nadinê. Lê tu eleqeya wê bi tirkî nîn e.**

ça" ye. Ev her du peyv jî peyvên hevpar ên kurdî û farisî ne.

Ji bo me peyva */kel/* diyar e, çawa ku em di kurmancî de dibêjin kelê serî û hwd. Ne zelalî di peyva */paça/* an jî */baca/* de ye. Em daxuyînin ku her du peyv yek in, tenê ji aliyê teşeyê ye guherîna di wan de çêbûye. Li vir, ji ber qanûna hêsangotîne guherîna di dengên */p/* û */b/yê* û di dengên */c/* û */ç/yê* de ye. Me di xebatên xwe yên berê de der barê pevguherîna dengan de hin agahî dabûn. Ji lew re em dê li ser vê babet û mijarê nesekînin.

Peyva */baca/* an jî */paça/* di kurmanci-

ya me ya îroyîn de beramberî van peyvvan e: *pa*, *paq*, *pêq*, *pîjaq*, *qor*, *çaq*, *çêq*, *çêx*, *çîm*, *çîp*, *şeq*, *pêç* û *pêçik*.

Bi taybetî me */pêç/* û */pêçik/* li dawiyê nivisandin. Ji van her du peyvvan xuya dibê ku, */baca/* û */paça/* ji zimanê me re ne biyan û xerîb in. Bi gotineke din, */pêç/* û */pêçik/* û */baca/* û */paça/* eynî ne. Dibe ku */pêçik/* peyva */pêçik/* bîne bîra me. Bi ya me, têkiliyek di navbera wan de heye. Lê em niha bi awayekî mîsoger naşên ku tişteki der barê wan de derbibin ango bibêjin. Jixwe li gorî hin zimanzanên me, ji tiliyên

pê û ling re */pêçik/* tê gotin. Li aliyê din, di kurmancî de ji bo piyên dewaran (ji çokê berjêr) "*çaqotk*" tê gotin, ku ew beramberî peyva */paça/ya* di "*kelepaça*" de ye. Piştî van daxuyaniyan îcar em bifetilin ser parkîta */nak/*. Ev parkîta di zimanê me de jî zehf tê ditin. Nimûne: *xem+nak*, *tirs+nak*, *hêwil+nak*, *xeter+nak*, *derd+nak*...

Di nimûneyê de dengê */k/* li dengê */x/yê* dageriyaye, her wiha di mînak "*bacanaq*" de jî dengê */k/yê* li */q/yê* dageriyaye. Ev qewmîn, di ziman de qewmîn û rûdanên asayî (normal) ne.

Ji bo vê peyvê wekî encam em bi hêsanî dikarin van bibêjin: Ev peyv qet ne bi tirkî ye. Ji aliyê din ve, ev peyv peyveke pişkdar (muşterek) a kurdî û farisî ye. Em vê jî bibêjin ku faris peyvê wekî "paçenak" bi lêv dikin.

**qûşax:** Peyv hevedudanî ye û mîna */qûşaq/* jî tê bikaranîn. Ew ji navdêra */qûş/* û ji parkîta */ak/yê* çêbûye: *qûş+ak*.

Em bi bîra we xwendevanên hêja bixin ku di ferhengên tirkî de ev fena (mîna) peyveke tirkî tê nîşandan. Lê ev peyveke resen a kurdî ye. Carek di kurmancî de peyveke me ya bi navê */qûş/* heye, ku ew parçeyeke palan û kurtanên heywanên bar e û tê paşiya wan. Her wiha ew jî çerm hatiye çêkirin. Di nav gel de bi hêsanî mirov rast li biwêj û gotinên wekî "*Bi vê qûşê tu naçî Mûşê*", "*Me qûş le qetand*", "*Me qûş lê teng kiriye*" tê.

Îcar peyva */qûşax/* ku awayê wê ye rast */qûşak/* e û bi alikariya parkîta */ak/* çêbûye, ji bo piştî, piştik ku mirov li nav û newqên xwe girê didin, tê gotin. Ew jî, ji mûyê bizanan tê çêkirin, wekî qayîş û kemerê ye û pehn e. Der barê parkîta */ak/* de jî em çend nimûneyan bidin: *ron+ak*, *civ+ak*, *hon+ak*, *porç+ak*... Ji bo pevguherîna dengên */k/*, */x/* û */q/yê* jî, em vê daxuyînin. Di xebatên me yên berê de bi awayekî kûr û fireh em li ser pevguherîna wan rawestiyane, ji lew re em pêwîst nabînin carek din dest biavêjin wê mijarê.

ZANA FARQÎNÎ

## Newroz cejna kê ye?

CELALETTİN YÖYLER



Di roka pîrozkirina cejna newrozê, digihîje 2000 salî berî çêbûna Îsa Pêxember silava Xwedê li ser be. Ev cejn jî hêla gelê kurd ve, ji dema berî Îsa bi 2000 salî ve li ser bingeheke astronomî, xwezayî û biyolojî, di vegera her saleke nû de tê pîrozkirin. Belê, ev lêkolîn û nixandîneke zanyarî ye. Lewre di 1'ê adara zerdûştî de, di 8'ê adara rûmî de, di 21'ê adara mîladî de roj û şev dibin yek. Hem hemû heyînen xwezayî ax, av û hewa, dikevîne vejîneke taybet, hem jî dest bi demsaleke bi gul û giha bi dar û bi hêşînahî û çandîni dest pê dike. A ji ber van sedeman, gelê kurd ê kevnare bi pêzanîna xwe ya li ser zanîna astronomî û xwezayê vê roja bi xêr û xweşî û hêşînayî jî xwe re wekî sersala nû dipejîrîne.

Çawa ku me berê jî da zanîn, di dîroka 2000 sal berî Îsa gelê kurd bi serokatiya padîşahê xwe Nemrûd ev cejn bi wateya ku me gotî, pîroz kiriye. Mînakên berçav û dîrok jî pîrozkirina vê cejnê re pûtîkênandîna Îbrahîm Pêxember e (silava Xwedê lê be). Lewra Îbrahîm Xelîl di wê roja yekê adara zerdûştî de, di wê dema ku gelê kurd bajar berdabû, derketibû şahiya cejna Newrozê û perestgeha pûtên gel bê parastin mabû de wan pûtan yek bi yek dişkêne û bivirê di destê xwe de diavêje stuyê pûtê mezin. Dema gel jî şahiya Newrozê dizivire, di perestgehê de ji bilî pûtê

mezin hemû pûtan şikestî dibîne.

Ji bona şikestîna pûtan, Îbrahîm jî hêla Nemrûd ve tê tawanbarkirin û cezakirin, bi şewitandîna di nav agir de. Ev qewmîna ku berî Îsa bi 2000 sal bûye, delîla herî mezin a dîrokî ye ji bo pîrozkirina cejna Newrozê jî hêla gelê kurd ve. Hem jî bi ramanê zanyarî û felsefî.

Dîtineke dinê ji qewmînen dîrokî yên cejna Newrozê, ji bo gelê kurd qewmîneke şoreşgerî ye. Ev qewmîna şoreşgerî jî, 612 sal berî hatîna Îsa Pêxember jî hêla "şoreşgerên kurd" ve, bi êrişa li ser împaratora koledarî û stemkar a "asûr" derketiye meydanê.

Ev livbaziya han a şoreşgerî bi danîşana kurtedîrokî, a wiha ye. Di wê demê de împaratora asûr, di Rojhilata Navîn de gelê Kurdistanê digel hemû nijad û neteweyên di wê deverê de dijîn dixê binê desthilatiya xwe ya koledarî û wan tevan wek koleyan jî xwe re dixebitîne û diperçiqîne. Ji ber vê sedemê gelê med li hemberî koledariya asûran bi serhildaneke şoreşgerî derdikeve û wê koledariyê hildîweşîne. Hem jî împaratoriyeke bi navê "Med" dadimezirîne.

Ji ber vê tevgera şoreşgerî ya gelê med di deverên Rojhilata Navîn de ji her nijadî re serbestî û serfirazî û xweşî tê pê. Ew şoreşa ku di bin serokatiya Kawayê medî de tê pêk anînê, ew di roja 21'ê adara mîladî de, an jî di 1'ê adara Zerdûştî de dibe cejna şahiyê dîroka şoreşgerî.

Çawa ku berî vê şoreşê jî, ev cejna astronomî û xwezayî bû, wisa jî dibe cejneke şoreşgerî li hemberî koledarî, nijadperestî û sitemkariyê. Ji ber van pêkanînen şoreşgerî yên birûmet, gelên di Rojhilata Navîn de bi hev re wekî gelê kurd serbest û serfiraz dibin. Wê cejnê wekî cejneke şoreşgerî ya gelê med, hem jî wekî ya gelên Rojhilata Navîn dipejîrin. Hem jî di her salvegerê de vê cejnê bi gelê med re pîroz dikin.

A ji ber vê qasê ye ku em dibêjin Newroza 21'ê adarê, şahî û cejna şoreşa gelê kurd e, lê bûye malê hemû gelên ku di Rojhilata Navîn de dijîn, ji ber rizgarbûna wan ji bin nîrê koletiya împaratoriya asûriyan. A bi van kurtenixandînen dîrokî em dipirsin, cejna Newrozê ya kê ye? A em nixandîna vê bûyera dîrokî li hêviya xwendevanên xwe yên bi rûmet bihêlin.

Gelî xwendevanên birêz, dema ku em bala xwe didin pîrozbahîya Cejna Newroza ku "Mem û Zîn, Tajdîn û Sîtiyê" di nav dilê Mezrabotan de li bajarê "Cizîrê" di şahî û dîlana Newrozê de gustîlên xwe bi hev diguherînin, em tu kesî jî nijadperestan û dijminê çand û dîroka gelan di nav pîrozbahîya wan Newrozîyan de nabînin. Newroza ku di Zîndana Âmedê de lehengê mezin Mazlûm Doğan, dîsa li Âmedê lehenga birêz Zekiye Alkan, li bajarê Îzmirê keça delal Raşan, li Almanyayê xwişkên birêz Ronahî û Bêrvan bi canê xwe yê şîrîn agirê Newrozê geş kirin û Newroza heft mezin birûmet û şoreşgerî pîroz kirin. Her wiha van lehengan di dîlana şoreşgerî ya Newrozê de "hêkîç nelîstîn."

Belê di dîroka kevnepereştîyê xwînxwariyê û dagirkeriyê de her tim beropaşkirin û listîna bi rûmet û nixrê gelêrî yên gelên bindest, hebûye.

Çawa ku îro nijadperest dixwazîna rastiya dîrokî beropaş bikin, hem jî rengên gelêrî yên gelê kurd jî xwe re bikin mal, wan rengên ku bi sedansal berê wêjezanên gelê kurd di gotinên xwe yên wêjeyî de anîne ser ziman û pesnê wan dane. Wekî nimûne pesindayîna her sê rengên gelêrî yên gelê kurd di dîwana Melayê Cizîrê de bi vî awayî:

Demê di bisk û xemiryan, ta û lefîan dişetiryan  
Ma ne temamî kesk û sor û bedr e li dorê hale kir.



# Wêneyên şehîdan

Em ji hunermend, nivîskar û rewşenbîrên xwe bawer in ku wê ew di dema nêzik de van çavkaniyan ji xwe re bikin nimayên mezin. Ê ku li kolanên Ewrûpayê dijîn, wê ji qurzikan derkevin û wê bi çavekî hişyar li wan mêze bikin.

Ji kêmasiyan xelas bibin; ji dêvla ku li ser keça çerkez berhemên wêjeyî bidin, bila li ser şervanên azadiyê, li ser meşa wan ên ku di nav berfa Zagrosan de berhevan bidin.



**D**i nava qada hunermendiyê de li gelek welatan hunermendên mezin derketine. Bi berhemên xwe yen hêja ji aliyê pir kesan ve tene nasîn. Û li ser navê wan hunermendan, ew welat tene nasîn. Belê welatên wekî Îspanya, Rûsya, Fransayê her hunermendê ku derketiye bi berhemên xwe, çand û wêjeya gelê xwe, bi gelên din daye nasîn. Em dikarin vê yekê li ser nivîskaran jî bibêjin. Her romanek, demekê ji mirov re dibêjin. Dema mirov romana şoreşa welatekî dixwîne pê derdixe ku şoreş bi çi rengî, di nava civakeke çawa de, bi mirovên çawa çêbûye? Her xwendevan bersiva van pirsan di nav wan pirtûkan de dibîne.

Di nava şoreşa hemdem de heya niha xebata ku li ser vê yekê tê meşandin bîr û baweriyekê dide mirovan ku wê rojekê li Kurdistanê jî berhemên bi nav û deng derkevin. Anîha hemû pirtûkên Serokê neteweyî ji bo vê yekê gaveke mezin in. Her nivîsek serokatîyê, kûr û fireh rê li ber vê yekê vedike. Xebata li ser "Jiyaneke çawa" di vê dema nêzik de ji her kesî re xîtab dike. Ji pirsgrêka malbatan bigire, hetanî xwedîkirina zarokan pir tiştan nîşanî mirovan dide. Nivîskar, hunermend, şervan, jin, mêr û evîndar... her kes xwe di vê berhemê de dibîne.

Her gerilayê ku şehîd dikeve, bi şahdetê xwe destanekê dinivîse. Jiyanê her şehîdekî bi dewlemendiya xwe roman e. Ev roman roj bi roj tê nivîsandin. Ji ber vê yekê divê ev jî terefê me ve bê xwendin û fêmkirin. Çi li çiya bin, çi jî di girtîgeha bin di vê dema dawî de zêdeyên şoreşger şehîd ketine. Ji wan şehîdan ên ku zêde li ser mirovan bandora mezin çêdikin, bi piranî jî yên ku wêneyên wan di rojname û kôvaran de hatine çapkirin in. Ew agir bi dilê mirovan dixin. Ê ku li wan mêze bike negengaz e (mumkun) ku êşeke bi sewat di dilê xwe de his neke.

Bes ev kes bila his û diliyên (hest) mirovahiyê di dilê xwe de jiyana bike, wê pir tiştan ji wêneyên şehîdan fêm bike.

## Wêneyên şehîdan û naskirina jiyane

Mirov li hin wênayan mêze dike. Ê çiya, newala, çem, kanî, rûbar û bahrekê, an jî yê kulilkên ku di biharê de der dor seran ser rengîn dikin. Bandoreke mezin li ser mirovan çêdike. Mirov bi dîtina wan bi eşq û şewq dibe. Ew wêne bi xweşîkbûnên xwe dibin sedema pir tiştên hêja. Her yek bi dewlemendiya xwe dibe çavkaniyên berhemên mezin.

Demê em li welatê xwe mêze dikin, welatê me li ber çavan bi xwe "wêneyekî zindî" ye. Eger mirov bixwaze bi xwe re hest û diliyên mezin çêbike, Kurdistan ji bo vê yekê amade ye. Şaîr, nivîskar, hunermend her kes kare jî vê yekê îlahamê bigire.

Demê mirov Kurdistanê jî xwe re bike mane, dibe gelê kurd jî cihê xwe tê de bigire. Bi piranî jî pêwîst e ku şehîd tê de cihêkî girîng bigirin. Ji ber ku şehîd hêza jiyaneke birûmet in. Eger ku ji dervayî şehîdan û bêyî wan gelê kurd bê naskirin wê di vê naskirinê de kêmasî çêdibe.

Ew wêneyên şehîdan ku hatine çapkirin: Leşkerên neyaran wekî gurên har li ser laşên wan civiyane. Her leşkerekî perçeyek ji laşê şehîdan ji xwe re biriyê. Ê ku pozên wan, ê ku guhên wan, ê ku dest û piyên wan; her zarokêkî gurên har ji xwe re perçeyek ji laşên şehîdan birîne. Ew şehîdên li ser berfê şîlf û tazî hatine dirêjkirin, gurên har li ser wan bi lepê xwe yê gemar kêr avêtine gewriya şervanên azadiyê. Di her lepekî wan de perçeyek ji bedenên şehîdan, lingên wan li ser laşên şehîdan. Ew şehîdên bi rûmet, ew simbêlên xelekî, ew rûyên şîrîn, ew porê şehkîrî ku hîna xirab nebûye di destê neyaran de, divê em nas bikin. Ew keça ciwan di nav koma leşkerên neyar de

bi heybet li erdê dirêjkirî ye. Gur li ser serê wê jî kom bûne. Destê xwe avêtine porê wê. Ew keça Ezîze bi şehîdbûna xwe jî kulma xwe şidandiyê û destê xwe rakiriyê hewa. Ew kulma bi hêrs dixwaze çî ji me re bibêje? Belê wêneyê şehîdan ji me re diaxivin, divê em jî karibin ji wan fêm bikin.

Di vê dema nêz de, di 24'ê rezberê (îlonê) de êrîşek li ser Girtîgeha Amedê pêk hat. Di vê êrîşê de deh girtiyên azadiyê hatine şehîdkirin. Ji wan kesan wêneyên çar heban di rojnameyan de hatin çapkirin. Eger ku zimanê kaxîzên rojnameyan hebûya wê qirîneke çawa bidana. Wê gazincên bi çi rengî bikrana? Lê belê ew kaxîz, nikarin wan tiştan bikin. Lê belê wêneyên li pêş çavên me van diliyên han bi me re çêdikin. Ji ber ku ew wêne di navbera me û neyar de hesab dîtina sed salan e. Seriyên girtiyên azadiyê, bi jop û qalasan hatine pelaxandin, ên rûyê tev di nav xwinê de mane, ew laşê tev bi birîn, rastiya welatê me ye. Ew derbeyên ku li wan diketin bi tînanê wanê şêrî nedişandin. Hemû gel û mirovahî bi wan re êşiyên. Xwîna ku ji wan diherikî hêstirên çavên welatê rojê bûn. Ew dîrûşmên ku ji devên wan şehîdan di nav dîwarên zîndanê de bilind dibû, ew deng, dengê hêrsa çiyayê welatê rojê bû.

Anîha wêneyên şehîdên me jî, rastiya şoreşa me û welatê me ji gelên din re didin xuyakirin. Di roja îro de li tu welatan şerek wisa qirêjî nayê meşandin. Ji bo ku cihan bi vî şerî bihêse û rastiya neyarên me fêm bike, wêneyên şehîdên me îspata zindî ye.

Divê çend gotin li ser kesên ku li derveyî welat dijîn, ji wan re jî bînin gotin. Hîna pir kes hene ku qet li welat nejiyane û jê dûr in. Ji rastiya şer û şoreşê dûr in. Rast e, sedema hemû tiştên neyar e, ji ber ku jêderka hemû rewşên xerab neyar e. Lê, madem dijmin bûye sedema dîr-

ketina ji welat; em bawer in wê şehîd jî bibin sedema vegera welat. Veger bila tenê wekî vegera fizîkî neyê fêmkirin. Veger ev e ku mirov bi his, bi mêjî û bi dil vegere welat.

Ê ku ji welat dûr in, bila zanibin ku welat nêzikî wan e. Wêneyên şehîdên welatê rojê bedela hemû çavkaniyan e. Madem ku heya niha em bi roman û berhemên xwe nikarin bi zimanê biyan bi gelên din bidin nasîn. Ji ber ku nivîskar û wênevanên me kêman in.

Madem ku romaneke me ya wekî "Dayik" bi gelek zimana nehatiye nivîsandin, ku nav û dengên şerê me li nav neteweyî belav bike. Em dikarin bi wêneyên şehîdên xwe şoreşa xwe bi gelan bidin nasîn.

Hîna rewşa hevala Leyla Kaplan (Rewşen) li ber çavane. Dema bombe li ser bedena xwe teqand, hemû perçeyên laşê wê pekiyan derekê. Ew seriyê wê yê ku pekiyabû ser xanî, ew goştê wê li meydane belav bûbû, mirov nizane bê wê çawa bi çi nimayên nîgaşî taswîrên wan bike.

Em ji hunermend, nivîskar û rewşenbîrên xwe bawer in ku wê ew di dema nêzik de van çavkaniyan ji xwe re bikin nimayên mezin. Ê ku li kolanên Ewrûpayê dijîn, wê ji qurzikan derkevin û wê bi çavekî hişyar li wan mêze bikin. Ji kêmasiyan xelas bibin; dêvla ku li ser keça Çerkez berhemên wêjeyî bidin, bila li ser şervanên azadiyê, li ser meşa wan ên di nav berfa Zagrosan û şewitandina goştên wan û birînên li ser singên wan berhevan bidin. Ji dêvla nivîsên entelektuel û polemîkî ve bila hemû reaksiyona xwe jî bo gerilayên azadiyê yên di nav her du lepên neyar de, derxin holê. Tevî ku şehîd ne bi hewceyên helbestan e, lê di şerê çend stran û helbest li ser van pakrewanan, bînan ziman, deynê namûsa me ye.

MURAT KAYA





- 6.04.1963: Komek xwendevanên Swêrekî li Stenbolê bi navê "Keko" kovarek derxistin.
- 8.04.1987: Ji Komîteya Navendî ya PKK'ê Mehmet Sevgat (Bedran) di şerê Çiyayê Herekolê de şehîd bû.
- 10.04.1991: Serhildana başûrê Kurdistanê ya avrêla 1991'ê, ji aliyê hêzên dewleta Iraqê ve bi êrîşeke hovane hate perçiqandin. Bi hezaran kurdên başûrê Kurdistanê koçberî Tîrkiye û Iranê bûn.
- 11.04.1993: Diya' Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, Esmâ Uveys Öcalan li Misisa Edeneyê wefat kir. Li ser wesiyeta wê, cendekê wê li Omerliya Xelfetê hate binaxkirin.
- 10.04.1994: Ji kargerîya HEP'ê ya navçeya Qoserê (Kızıltepe)

Şêx Davûd Yalçinkaya, ji aliyê hêzên tarî ve hate kuştin.

● 12.04.1995: Rêveberê HADEP a Yûreğira Edeneyê Rûstem Akar, ji layê hezên tarî ve hate kuştin.

● 12.04.1995: Parlamentoya Kurdistanê li Derveyî Welat (PKDW), roja 12'ê avrêlê li bajarê Laheya Hollandayê, li Salona Nederland Congres Gebouwê vebû.

Endamên Parlamentoyê di bin serokatîya Îsmet Şerîf Wanî' de yekemîn kombûna xwe pêk anîn. Parlamentoya Kurdistanê ya ku ji 70 derhûdf (parlamentarî) pêk hatibû, di yekemîn kombûna xwe de ji bo serokatîya parlamentoyê Yaşar Kaya hilbijartin.

AWIR

# Hunermendek ji serê kaniya binxetê

Hunermend Mehmûd Ezîz Şakir di sala 1950'yî de li Başûrê Biçûk, li Dêrbêsiyê ji dayik bûye. Di sala 1967'an de dest bi xebata xwe ya li ser mûzîka kurdî kiriye û ji wê salê pê ve, bêrawestan vê xebata xwe ya li ser afirandin û bi pêşvebirina stran, awaz û mûzîka kurdî didomîne.



Ji Başûrê Biçûk Hunermend Mehmûd Ezîz Şakir, roja 28'ê adarê bû mēvanê NÇM'ya Stenbolê û konserê heja pêşkêşî guhdarên xwe kir. Konsera ku ji nêzî 60 kesî ve hate guhdarkirin û saetekê dom kir.

Hunermend Mehmûd Ezîz Şakir, di sala 1950'yî de li Başûrê Biçûk, li Dêrbêsiyê ji dayik bûye. Di sala 1967'an de dest bi xebata xwe ya li ser mûzîka kurdî kiriye û ji wê salê pê ve, bêrawestan vê xebata xwe ya li ser afirandin û pêşvebirina stran, awaz û mûzîka kurdî didomîne. Ew niha li Serê Kaniya Binxetê dijî.

Mehmûd Ezîz, piştî pîrozkirina cejna Newrozê ya mēvanan, sêzde stranên welatperwerî û evîndarî pêşkêşî guhdarên kirin. Di repertuera wî de ligel hin stranên wî, yên birayê wî Mihemed Elî Şakir, helbestên Yûsiv Berazî û Kemal Şanbaz jî hebûn. Li ber deng û ûda Mehmûd Ezîz, digel ku mirov dikare dilanê bigire, mirov dikare di kar kirinê de jî li wan guhdarî bike. Çimkî, gava

ku hin stranên dibêje (mezinên me ji wan re digotin dîrûkên şer), mirov dibê ber bi dîroka Kurdistanê ve, tēkiliyên mirovên kurdan û gotinên keç û xortên kurdan tîne bîra mirov.

Yek ji stranên wî ya bi navê "Newroza me hatî" ku ya birayê wî hunermend Mihemed Elî Şakir e, bersiva hemû derewên komara tirk ên der barê cejna Newrozê de dide. Gotinên stranên ev in:

*Newroza me hatî rûgeş e, tev pîroz e  
Di tacê gewr û rengîn de mîna lîloz e*

*Li Rewandûz e kohî Zagros e  
Her dil disûje cejnî Newroz e.*


*Cejna so- û loran e,  
Cejna sobar û midî, kelhor û mitan e*

*Cejna kurdan e, mêr û merdan e  
Dijî derdan e, cejnî Newroz e.*

SEVDA ELDEMİR

## ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YİĞİT



### Mamoste Şêx İzeddîn

Yekîtiya neteweyî di dereceya yekemîn de yekîtiya fikrî û rewşenbîrî û rakirina sînoran dixwaze. Mebest li vir sînorên nav dil û mêjî ne. Ev sînor ji sînorên cografîk yê ji tēlan û tije mayî jî asêtir in. Ew bûne faktoreke navxweyî ji bo berdewamiya sînorên cografîk. Dema mirov sînorên zîhnî, psîkolojîk, kulturî, mezhebî, û diyalektal bi sînorên fizîkî re muqayese bike, bide berhev, dê mirov bibîne ku dualî hevdu xwedî dikin, hevdu gur dikin û yek zemîn û sebeba din e.

Sînorên fizîkî dikarin dema din hebin. Lê belê yê manewî fikrî îro mirov dikare rake û nehêle sibehê. Ku ev rabûn û yekîtiyê xurt çêbû yê fizîkî jî hew xwe digrin. Ji bo wê jî naskirina perçeyên Kurdistan û şexsiyetên kurd pêwîst e. Bi wê pêwîstiyê min dil heye ez hinekî xwendevan li ser Mamoste Şêx İzeddîn Huseynî serwest bikim.

Mamoste kurê Şêx Salih Huseynî ye. Sala 1922'yan li bajarê Bane ji diya xwe bûye. Bavê wî Şêx Salih Huseynî ji alimên xurt û jêhatî yê zemanê xwe ye. Wekî gelek zana û rewşenbîrên dîni ew dersdar e, gelek şagirt û feqe gihandine û perwerde kirine.

Mamoste xwendina ewil li ba bavê xwe dîke. Pişt re bi rêzê ji hejmareke alimên Kurdistanê dersan distîne û di zikê hev de 9 salan li ber destên alimên mîna Mele Seîd Huseyn li Sîsê, Mamoste Elî Welzî li gundê Hemayna li Bokanê, Mele Şêx Hesen li Şiler (Bokan), li ba Mele Mihemed Huseynê Mecdî li Sabaxê (Mehabad), Mamoste Mele Bekir li Merîvanî dixwîne. Mele Mihemed Huseyn Mecdî her wiha sala ku Cumhûriyeta Mehabad çêdibe, Wezîrê Dadmendiye ye.

Sala 1945'an Mamoste endamê rêxistina jêkaf, Komeley Jiyanewey Kurdistan e. Piştî ku Mamoste xwendina xwe diqedîne û îcazê digire, heta ketina Şah a sala 1979'an li dora 30 salan dersdariyê dîke û bi sedan şagirtên kurd bi firê dixê.

Têkiliya wî tim bi welatparêziyê re xurt û zindî ye û di nav şexsiyetên Rojhilatê de ji çend kesên herî naskirî ye. Xelkê hez jê dîke, hurmet û îhtîrama wî heye.

Ew bi xwe çendî mele û şexsiyetek dîni be jî radîkal e, bi xurtî li dijî zulmê û çavsoyîyê ye. Îstîsmar û çewsandinê napesinîne. Bawerîya wî bi ilm û pêşketinê qewîn e û hevalbendê wekheviya neteweyî, civakî û ekonomîk e. Mamoste nasnekirina mafên kurdan ji aliyê wan dewleta ve ku bi navê îslamê qise dikin wekî minafiqiyê bi nav dîke û ji gunehkariyên herî mezin dihesibîne.

Bi ketina rejîma Şah re popûlarîta Mamoste zêdetir bû. Êdî li ku rakirina cenazeyekî hebûya, meş û xwepêşandanek li ku li dar diket Mamoste İzedîn Huseynî li wir bû û axaftinên radîkal û welatparêz dikirin.

Sala 1980'yî li ser navê kurdên Rojhilat heyetek bi İmam Xumeynî re rûnişt. Di nav wê heyetê de Mamoste İzeddîn yek ji çend şexsiyetên herî xwedîprestîj bû. Heyetan li hev nekirin û tiştêk nexistin serê hev. Li ser rabûnê İmam Xumeynî ji Mamoste re wiha dibêje: "Ez emniyeta Kurdistanê ji te dixwazim." Û ji Mamoste jî wê bersivê digire: "Ez jî mafê kurdan dixwazim."

Di wan salan de Şêx İzedîn bi navê "Defter" ku mîna "Deftera Şêx İzedîn" derbasî dîroka siyasî ya Rojhilatê welat dibe, dezgeheke neteweyî dadimezirîne. Ev avahî 8-9 salan di nav xebata siyasî, civakî û kulturî de roleke berçav û xweser dilîze.

Mamoste İzedîn Huseynî niha li Swêdê rûdine guhên wî tim li ser Kurdistanê ne. Ew bi taybetî bi vebûna MED-TV û Parlamentoya Kurdistanê li Derveyî Welat gelek kêfxweş e.



## Rojnamegerê Îngiliz Nick Brain:

## Gelê kurd ji pêşerojê hêvîdar e

**Gelek heyet Ji bo çavdêriya pîrozbahiyên Newrozê hatin. Yek ji wan heyeteke Îngiliz bû. Vê heyetê li Elezîz û Çewlik çavdêrî kiriye. Ev heyet hate serdana me jî. Rojnameger Nick Brain di nav heyetê de bû. Hevalên me METİN AKSOY û GÜLSEN BUDAK bi wî re hevpeyvînek çêkirin. SAMÎ BERBANG ev hevpeyvîn ji Îngilizî wergerande kurmancî û em wê pêşkêşî we dikin.**

**P**êşî em dixwazin hûn xwe bi me bidin nasîn.

● Belê navê min Nick Brain, ez 29 salî me, li Londona Îngilistanê rûdinim û 5 sale wekî rojnamegerekî serbixwe xebatê dikim. Ez jî bo rojnameyekê tenê naxebitim, jî bo gelek rojnameyan gotarên dirêj dinivîsim. Ji bo rojnameyên The Independent, The Guardian û kovarên Sunday Express, The Economist, The Observer û hwd. nivîsan amade dikim. Ez hem jî bo rojnameyên neteweyî û hem jî ji bo hinek kovarên taybet, nivîsên cur be cur dinivîsim. Ez nivîsên dirêj dinivîsim, ne nûçeyan.

*Hûn bi piranî li ser kîjan mijaran dinivîsin, bi kîjan mijaran re eleqedar dibin?*

● Bi awayekî giştî nivîsên dirêj li ser bûyerekê, welatekî, gelekî dinivîsim. Di wan nivîsan de li ser aliyê siyasî, civakî û çandî tê rawestîn. Bo minak, min li ser IRA'yê, MED-TV û kurdan, komikên faşîst li Îngilistanê û vejîna olî û mirovên tundrew ên îsewî hin gotarên dirêj nivîsandine. Ez bi piranî li ser mijarên çandî disekinim. Li şûna ku ez herim, her roj nûçeyên şer binivîsim, ez li nivîseke gelekî dirêj li ser wî şerî dinivîsim. Bo nimûne min li ser kampên penaberan ên Bosnayê nivîsî. Ez nivîskarê wî rengenivîsê me ku bi Îngilizî jê re dibêjin 'feature'.

*Sedemên ku hûn anîn Kurdistanê çi ne, hûn dikarin hinekî qala wan bikin?*

● Ez hatim vexwendin ji bo ku beşdarî heyeteke mafên mirovan bibim. Ev heyet ji bo çavdêriya pîrozbahiyên Newrozê li seranserê Kurdistanê, pêk hatibû. Ez tevî vê heyetê bûm ji bo ku çavdêriya Newrozê bikim. Li Îngilistanê di du sê salên dawîn de hinek rêxistinên sivil li ser rewşa kurd û Kurdistanê hinek agahî belav kirin. Min bi xwe li ser kurdan ti-

tek nenivîsîbû, berî du salan çûm Kurdistanê sûrî min li ser çanda kurdên Sûriyeyê tiştêk nivîsî. Ev vexwendin ji bo min derfeteke baş bû ji bo ez rewşa Kurdistanê bibînim.

*Hûn çûn, we bi çavên xwe dit; hûn li ser rewşa Kurdistanê dikarin çi bibêjin?*

● Berê min PKK jî wekî IRA'yê dizanî, tiştên ku min xwendine min wisa dizanibû ku IRA biçûktir e ji PKK'ê. Lê dîsa jî min texmîn nedikir ku piştigiriya gel a ji bo PKK'ê ev qas pir e. Li Îngilistanê PKK wekî rêxistineke biçûk tê nîşandayîn, lê tiştên ku min dîtî ve rama-

**b**erê min PKK jî wekî IRA'yê dizanî, tiştên ku min xwendine min wisa dizanibû ku IRA biçûktir e ji PKK'ê. Lê dîsa jî min texmîn nedikir ku piştigiriya gel a ji bo PKK'ê ev qas pir e. Li Îngilistanê PKK wekî rêxistineke biçûk tê nîşandayîn, lê tiştên ku min dîtî ve ramanê pûç dikin. Min dît ku bi taybetî li Kurdistanê piraniya gel piştevaniya PKK'ê dike.

nê pûç dikin. Min dît ku bi taybetî li Kurdistanê piraniya gel piştevaniya PKK'ê dike.

Ez dixwazim hinek mînakên jî bidim, li Bingolê min dît, hinek tîmên taybet li ser kolanan li mirovan didan, min bi hinek mirovan re hevdiîn çêkir. Dîsa min dît tîman ew kes girtin birin qereqolan û dan ber pirsan. Tiştên ku min li Îngilistanê li ser tîmên taybet xwendine û tiştên ku min bi çavên xwe dîtî gelekî ji hev cuda bûn. Li Îngilistanê bi tenê polis û leşker hene, lê li Kurdistanê tîmên taybet, polis, leşker û kontra hene. Hêzên mezin ên ewlehiyê li Kurdistanê hene. Ez dixwazim mînakê bide. Dema pîrozbahiya Newrozê de rayedarên dewletê ji me re gotin: "Hûn dikarin bi gel re hevpeyvîne bikin, xem nîn e, li Elezîzê



min xwest bi gel re bipeyvîm, lê çî wextê ku ez nêzî mirovan bûm, min li pişt xwe mirovekî bi kamera dît. Gel jî dema ew didîtin, nedipeyvîm.

*Di nava ew qas hêzên dewletê de helwesta gel çawa bû?*

● Min sê pîrozbahiyên Newrozê dîtî, du heb li Elezîzê, yek li Bingolê. Pîrozbahiya yeke min ku min lê temaşê kir,

bi kurdî û tirkî sloganên PKK'ê avêtin, hêzên dewletê bi awirên xwe dan zanîn ku bi van sloganên kêfxweş nebûne, lê wî xortî bi tirkî slogana "Kurdistan wê ji faşîzmê re bibe goristan" avêt. Hûn dizanin li bajarê Elezîzê faşîst pir in, asîmlasyon jî bitesîr e. Aliyekî bajêr ji dût ve gelekî xizan xuya dikir, ez nizanim bi giştî çawa ye.

*Der barê pîrozbahiyên berê de çi agahiyên we hene?*

● Min hin tişt bihîstine, hinek tişt jî xwendine, lê agahiyên min gelekî hindik in. Divê ez bibêjim ku ez ne pisporê kêşeya kurdî me. Ez dikarim li ser çavdêriyên xwe yên li Bingolê hinek tiştan bibêjim.

Li dora 200 kesî li avahiya HADEP'ê civiyabûn, rojek mabû ji Newrozê re lê ew li hêviya me bûn, ji bo ku tevî me Newrozê pîroz bikin. Dewletê destûr nedabû pîrozbahiyê. Serokê HADEP'ê ji me re got ku berî çûyîna me polis çûne bûroya wî jê re gotine: "Heke tu derbarê dewletê de tiştêk neyînî ji Îngilîzan re bibêjî, wê serê te bikeve belayê." Berî deh rojan jî cihê karê wî hatiye bombekirin û polis gefa şewitandina erebeyaya wî lê kirine. Serokê HADEP'ê da zanîn ku kesên ku beşdarî pîrozbahiya Newrozê bûn wê %30 bîn girtin.

Li gorî çavdêriyên min li bajarê biçûk hêzên dewletê hê bi hêsanî dikarin erîşî gel bikin, zilmê li wan bikin. Li Elezîz, Amed û Stenbolê mirov tene teqibkirin, lê li Bingolê bi hêsanî tene girtin.

Serokê HADEP'a Bingolê roja din telefonî MED-TV'yê kir û da zanîn ku ew bi dîtina mirovên Îngiliz gelekî kêf-



weş bûye, piştî 6 salan yekemîn car Newroz hatiye pîrozkirin. Piştî-du rojan dimênên pîrozbahiyê gihîştibûn MED-TV û ew hatin weşandin. Ev serdana min yekemîn e ji bo Tirkiyeyê û serdana min a duyemîn e ji bo Kurdistanê, lewre agahiyên min hindik in.

*Psîkolojiya gel çawa bû?*

● Gel bi hêvî ye. Bi taybetî ciwan gelekî milîtan xuya dikin. Kesên rewşenbîr jî bijîşk, mamoste û parêzer jî bihêvî ne.

*Dewlet xwe nêzikî çareseriyê siyasî nake, digel hinek hewlên PKK'ê, hûn vê yekê çawa dinirxînin?*

● Min bi Waliyê Herêma Ne-asayî re hevdiîn çêkir. Min jê pirsî: "Çima di dibistanan de zarokên kurd bi kurdî nayên perwerdekirin?" bersiva wî bi vî rengî bû: "Dema em destûrê bidin zimên, pişt re wê qala serxwebûnê bikin." Li gorî dîtina min generalên tirk jî bi vî tîrê dijîn.

Di dema hevpeyvînê de tiştêkî balkêş jî qewimî. Walî bi min teyb da girtin ji min re got: "Ji HADEP'ê bigire heta bigihîje IHD'ê, gelek rêxistin cudaxwaz in." Her kes dipejirîne ku artêş hêza serdest a rastîn e, di çav artêşê de jî her tiştê tîkildarî kurdayetiyê cudaxwaz e. Rewş hinek dişibe rewşa li Çînê, her tiştê tîkildarî gelên hindikahî wekî tîbetê cudaxwaziyê tîne bîra wan.

IHD rêxistineke mafên mirovan e, ji mirovên mafparêz pêk hatiye, ew çawa dibe cudaxwaz. Kesên ku di nava IHD'ê de xebatê dikin ne di baweriyê PKK'yan de ne, lê ji ber ku ew jî dixwazin hinek mafên kurdan hebin, ji bo rayedarên dewletê cudaxwaz in. Li gorî dîtina rayedarên tirk hemû rêxistinên wekî IHD, HADEP û rêxistinên ku daxwazên ne radîkal jî cudaxwaz in.

Di hevpeyvînê de walî qet peyva kurd bi lêv nekir û tiştên wekî "terorîst ji derve tîne, em li dijî wan tîkoşînê dikin, ji bo başkirina rewşa gel bendavan, rîyan çêdikin" gotin. Lê ev gotin dîrî rastiyê bûn. Her wiha tenê diaxivî li gotinên min guhdarî nedikir.

*Ewrûpî ji aliyê mafên mirovan ve Tirkiyeyê çawa dibînin?*

● Li gorî baweriyê min tîkiliyên bazirganî yê xurt di navbera Tirkiyê û welatên wekî Îngilistan, Almanya û Amerîkayê de hene. Ew dewlet Tirkiyeyê wekî mertal dibînin, li hemberî êrişên welatên Rojhilata Navîn ên delodîn mîna Îran û Iraqê.

Ji ser vî sedemê, dewletên ewrûpî alîkariyê didin Tirkiyeyê, çekan difiroşin. Ew dixwazin bi vî mertalî xwe li hemberî pêla îslamî biparêzin. Lewre jî digel ewqas arîşeyên Tirkiyeyê jî wê diparêzin, dixwazin ku ew ji aliyê leşkerî ve xurt be. Her wiha ji ber hêman sedemê di medyaya ewrûpî de li ser rewşa mafên mirovan a Tirkiyeyê bi tenê kurtenûçe derdikevin. Gotarên dirêj û bernamêyên xweş di çapemenî û televîzyonan de der-nakevin.

Li aliyê din çand serweran li ewrûpîyê, berê gel guhartiye. Niha bi tenê gel li rewşa xwe ya aborî û ewletiya karê xwe, debara xwe difikirin. Bûyerên ku li derve diqewimin bala wan nakîşînin.

*Ewrûpî bi çî çavî li tirkan û Tirkiyeyê dinirxînin?*

● Ez bawer im gelek ewrûpî Tirkiyeyê

**S**ûper Walî bi min teyb da girtin ji min re got: "Ji HA-DEP'ê bigire heta bigihîje IHD'ê gelek rêxistin cudaxwaz in." Her kes dipejirîne ku artêş hêza serdest a rastîn e, di çav artêşê de jî her tiştê tîkildarî kurdayetiyê cudaxwaz e. Li gorî dîtina rayedarên tirk hemû rêxistinên wekî IHD, HADEP û rêxistinên ku daxwazên ne radîkal jî cudaxwaz in.

yê wekî cihê bêhnvedan û tafilê dibînin. Wekî mînak sala çuyî birayê min, perê xwe dan şirketeke turizmê û bi botê li kêraxa bahrên Tirkiyeyê geriya. Ev e nêzîktêdana mirovan ji bo Tirkiyeyê, di çavên wan de Tirkiyê bi dimênên xweristî û kêraxên bahrê tenê welatekî xweş e.

*Gelo ewrûpî dibêjin, bila Tirkiyê hinek daxwazên me yê aborî bine cih û wekî cihê bêhnvedanê jî bi kêrî me were bes e?*

Gel zêde guhê xwe nade rewşa Tirkiyeyê, Yewnanîstanê yan welatekî din, gelek jî dizanin ku hikûmet çekan difiroşe. Heke mirov rastiyê bibêje, ji wan re ne xem e. Heta şerê Kendavê jî zêde bala wan nekişand, bi tenê di televîzyonê lê temaşe kirin, ew qas. Ev gotin hem ji bo ewrûpîyan, hem jî ji bo amerîkîyan der-

*Berê digotin PKK karê narkotîk dike, lê paşê derket holê ku rayedarên dewletê bi xwe di nava vî karî de. Digel vê yekê jî ewrûpîyan zêde reaksiyon nişan neda çima?*

● Reaksiyon hate nişan dayîn, heta hinek dan û standinên min bi zilamekî îstîhbarata îngiliz re çêbû. Ew zilam di nava beşa tîkoşîna li dijî narkotîkê de kar dike. Ew piştî bûyera Susurlukê jî bo lêkolînê hate Tirkiyeyê. Wî ji min re got ku ew ne meseleya çeteyan e, gelek rayedarên dewletê di nav vî karî de ne. Mirovê ewrûpî jî, hikûmet jî dizanin çî diqewime.

Ez bawer im sedemeke nîqaşê di navbera rayedarên tirk û Klaus Kinkel de jî ew e: We dit, Kinkel got: "Divê hûn mafên mirovan biparêzin, kêşeya kurdî ç-

ma ew tiştêkî derew binivîse, kesê li hember, dozê lê vedike û cezayê pereyan lê tê birîn. Tu car rojnameger nayê kuştin. Li Îngilistanê van demên dawîn bi tenê rojnamegerekî hindistanî hate girtin, ew jî ne ji ber karê rojnamegeriyê bû. Li Îngilistanê rojnameger li hemberî karsaz û êrişên dewletê baş tîne parastin ji aliyê yekîtiya rojnamegeran ve.

*Der barê saziyên kurd de hûn çî difikirin, bi qasî ku we dîtiye?*

● Heke gelê kurd dixwaze hebûna xwe biparêze, divê pêşîn xwerûbûna çanda xwe biparêze. Saziyên wekî Azadiya Welat, MED-TV û NÇM'ê gelekî baş in ji bo vî karî. Bi karê ziman, dîrok, mûzîka kurdî re dadikevin, li gorî dîtina min divê ew ji neteweperweriya xerab dîr bin, wekî nijadperestiya afrikiyan. Mafê wan heye ku nasnameya xwe, çanda xwe biparêzin. Ji bo vê yekê jî rojname û televîzyon pêwîst e. Gelekî hurmeta min heye ji saziyên kurd re lewre di mercên giran de xebatên xwe didomînin, dewlet xebatên wan radiwestîne, ew jî nû ve dest pê dikin.

*Li ser MED-TV hûn dikarin çî bibêjin, hûn bi xwe çûne serdana wan?*

● Dema ez televîzyonên tirk û



bas dibe. Mirovên wekî min û wekî Karinê jî rêzê der in, li derveyî wê çanda serdest in. Baldayîna welatekî din û çanda gelekî din, çûna bo wan deran, pir zêde nayêkirin, ji layê mirovên ewrûpî ve. Li Îngilistanê nijadperestî jî heye, li Londonê gelek kom kurd, tirk û afrikî hene, gelek îngiliz wan naxwazin.

Li Almanya gelek tirk û kurd hene, lê li wir nijadperestî xurt e. Heta gelek mirovên biyan (kurd û tirk û hwd.) hatin kuştin. Sedema vî jî dexesî û metirsiya windakirina derfetên heyî ye. Ewrûpî naxwazin destkeftiyên bi destê hinekên din ve berdin. Gelek ewrûpî wisa bawer dikin ku wê biyan karên wan ji wan bistînin. Ewrûpî di nava federasyonê de dijîn, lê hê jî dêhna wan li ser rewşa hundirîn e: A rast rewşa me ji Tirkiyeyê ne çêtir e.

reser bikin." Li hemberî vî gotinê, Tan-su Çiller jî ew bi nijadperestiyê tawanbar kir. Hikûmetên ewrûpî her tiştî dizanin, lê dixwazin Tirkiyê ji aliyê leşkerî ve xurt be, tevî hemû aloziyan û arîşeyan ku ew pê re rû bi rû ye.

*Li Tirkiyeyê 141 rojnamevan ji ber ku rasî nivîsîna niha di girtîgehê de ne, hûn vê rewşê çawa dinirxînin?*

● Ew rewşeke erjeng (korkunc) e. Min bi rojnamegerekî kurd ku ji bo Kanal E dixebite re hevpeyvîn çêkir. Wî ji min re got ku li Tirkiyeyê sansûr nîn e. Li ser vî yekê min got heke wisî ye çima ew qas rojnameger hatine kuştin. Bersiva wî gelekî balkêş bû: "Ew pîrseke siyasî ye." Li gorî baweriyê min bersiva wî jî erjeng bû. Li Îngilistanê tiştê herî xerab ku bê serê rojnamegerekî, de-

MED-TV didim ber hev, kenê min tê. Lewre televîzyonên tirk gelekî xerab in. MED-TV bi xebatkarên xwe gelekî balkêş e, gelek ciwanên ji parçeyên cur bi cur ên Kurdistanê tê de kar dikin. Hinek neteweyên din jî tê de dixebitin. Lê arîşeyên wê bi hemû hikûmetên ewrûpî re hene, ji bilî hikûmeta Swêdê. Bi taybetî hikûmeta îngiliz zêde zorê li wan dike. Xeta weşanê ya MED-TV baş e li gorî televîzyonên tirk. Tê de bernamêyên xweş hene, lê ew dikarin rengê bernamêyên xwe xweşikîr bikin.

Wekî gotina dawî ez dixwazim li ser rewşa jinên kurd çend tiştan bibêjim. Li gorî tiştên ku min xwendine, jinên kurd di nav tîkoşînê de gelekî bi pêş ketine. Ev yek hêjayî lêkolînê ye û ji bo çanda kurdî gelekî baş e.



# Roj baş Mehabad

Wê rojê, bi berbanga sibê re ji xem û kerba dinê re çiya li çiya qêriyan, rûbar û kanîkên welatê jîn û evîne nerma nerma herikîn, sê caran axîn kişandin û bêdeng naliyan. Wê rojê, bavê min hêjta sinêla bû û dayîka min li malbavê sê cara dilê wê bi qîzanî li hev ket û nizanîm cara çendan bû ku sê carên dîtir li dûv hev bi qîzanî zikê wê çelqiya.



MİHAMMED HUSEN SAYE QADI, QADI MIHEMED, EBDUQASIM SADRI QADI

ma stran û awaz man  
ku li ser te nehatin gotin?  
ma giyan û naz man  
ku bi çûn û hatina te nexemilîn  
û nehatin sotin?

Lê nêzik e adar  
ku çavên Xecoka bendewar  
bikenin  
û pir nêzik e adar  
wê dawî bê ev zêmar...

**W**ê rojê, min tu carî bawer nedikir ku îro roja me wê ji hemû rojên berî xwe zûtir hilê. Dibêjin ku; roja xweş ji hungura êvarê diyar e...

Her çende êvara wê rojê ji risasê Hgirantir bû jî, lê ew şeva ji risasê girantir zû bi dawî hat.

Îro, sîh û yekê adarê. Roja geş digel Itava xwe ya xweş ji hemû rojên berî xwe zûtir hilat û dereng çû ava.

Le pirdî sûr bew lawa  
Papûzey heldawa  
Pawpûz elêy zêr e  
Xalanî têkirawa...

Wê rojê, bi berbanga sibê re ji xem û kerba dinê re sê şemalkên pir ronî û di geş sê caran çirûşîn, sê caran hatin vemirandin...

Her cara ku şemalkên evîne dihatin vemirandin, dilê Zîna jar û bendewar diariya û li dera han xortekî sindî bi wî zarê xwe yê nazik û cindî piştî vemirîna şemalkan nizanîm bi

çend salan li ser rewşa pîrgiryan ya xoştiviya Xanî, Pîremerd û Hêmin wisa dinaliya...

Kurdîno rabin bibînin  
berxekî jar û zêif  
Dane ber pal û kêşana  
xencerek dijwar li dîv  
Taziya Qazî ji bîr neken  
bo biken şînî her sal  
Kuzirîn baxê çiyayan  
nêrgizê şeng û şepal  
Ristekê şengê bo vedan,  
canfidayê rastiyê  
Çûn ser sêdar û qinaran  
hewar e li kurdîniyê...<sup>(1)</sup>

Wê rojê, bi berbanga sibê re, ji xem û kerba dinê re.. Nagehan asmanê Seblaxê sê caran ji hev pijikî, qewşanên stêran sê caran cih guhertin, stêr yek bi yek ji mujganên xwe sê caran hatin xwar û li gorepana Çarçirayên nivkuştî, li ser sê gorên niv diyar, sê caran reşbelek girêdan û bi yek dengê ji hezaran devî lîlandin.

Wê rojê hetanî bi rojhelat şahî û govend gerandin. Vedenga awaz û tîlliyan, digel vedenga baz û qumriyan, bi kezebeke şewitî û bi dilekî pir evîn, newal û panav, piyak û hindav ser û binê welatê jar û xemgîn hambêz kirin û ew alandin.

Wê rojê, bi berbanga sibê re ji xem û kerba dinê re, ji Dêrika Çiyayê Mazî ber bi Seblaxa xemgîn ve ji dengê xortekî dilawer û bi xwe bawer silav û rêzen wefadariyê wisa dihatin hinartin:

Ey pêşewayê bi nav û deng,

heger dijmin tu kuştin  
wî navê te yê pir şêrîn  
hetanî bi ebed hiştin.  
Çi gava ku lingên te  
li ser serê wan kil dibûn  
vîyanên te ber bi asman ve  
bêhtir bilind dibûn...<sup>(2)</sup>

Wê rojê, roja te ya dawî bû adar. Ew jî mîna hemû rojên te ne bes bedbext, bêbext û bawî bû adar. Bi xatirxwestina te ya wekî her car, disa çend dilopên avzêrîn, bi ser deryaya kurdayetî ya pir rûmet û dêrîn bariya.

Wê rojê, bi berbanga sibê re ji xem û kerba dinê re çiya li çiya qêriyan, rûbar û kanîkên welatê jîn û evîne nerma nerma herikîn, sê caran axîn kişandin û bêdeng naliyan. Wê rojê, bavê min hêjta sinêla bû û dayîka min li malbavê, sê cara dilê wê bi qîzanî li hev ket û nizanîm cara çenda bû ku sê carên din li dûv hev, pêl bi pêl û bi qîzanî zikê wê çelqiya.

Wê rojê, bi berbanga sibê re ji xem û kerba dinê re dengê xortekî Hesarî yê zîz û şewat ji Amûda rengin bênavebir wisa dihat:

Xakî Kurdistan bibit bi qurban  
pir ciwan û pakijî  
Xwîn rijandin pir kurên te  
wa li her alî rijî  
Lê bi kuştin û bi zindan  
miletê kurd namirî  
Aferî, Aferî, Aferî...<sup>(3)</sup>

Wê rojê... Piştî wê rojê nizanîm bi çend salan, her li wan rojên bîranîna bav û kalan, ji çal û zidyanên xwînewî yên Ameda rengin sirûda evîn

û azadiyê li kolan û şeqaman darijî bedena Amed bi wê pozbilindiya xwe ve carê ne bes sê caran, gelek caran jiya, hejiya û bi dengê zîzî zagroştî wê çiya:

Gelek derbên wisa xwarin,  
lê carekê jî nerûxiya ev be  
Bi hezaran anîn şûna xwe  
yê ku bi tenê çû sêdarê devî...

Wê rojê... Tu caran nehate jibîrkirin, û tu caran nayê jibîrkirin, ew roj û ne ew rojên dîtir.

Ey Pêşewayê bi nav û deng, ew çar çirayên nivkuştî îro li seranê rî welatê evîne di geş in. Nevî û ne çirkên we, bi pêngavên xurt û bi bawer ber bi armanca we ya pîroz, bi gorepana Çarçiran, ber bi gulîşan we ve, ji bo govend û zemawend, jî lidarxistina dilana reşbelek ya serm dimeşin. Ê ew roj... Tu caran nehate bîrkirin û tu caran nayê jibîrkirin, ew roj û ne ew rojên dîtir.

Piştî çûna te bi çil û şeş salan, ji keçika Şîrnexî digel hevalan, jî rê sibê heta êvarî, berî û piştî ku gulîşan wan dibarî, li nav kolan û şeqaman Hewlêra xopan sirûd û dirûşma jî evîne digotin:

Bakur, Başûr, Rohilat  
Yek çarenûs, yek welat!  
Roj baş gerîla!  
Roj baş Mehabad!

DILDAR

1- Bedirxan Sindî  
2- Qedrican  
3- Cegerxwîn





Li navendên çandê çalakiyên ve hefteyê

LI NÇM'ya Stenbolê

● 9.04.97 Çarşem: Semînera Zanîngeha Azad, Murad Akıncılar " "Di sala 3 kêm 2000 de Kûba" saet:18.00

● 11.04.97 În: Konser: Ji Stran Kültür Merkezî Koma Dengê Azadî, saet:16.00

● 12.04.97 Şemf: Konsera Koma Gulên Xerzan, saet: 14.30

Fîlmê Sıkiyönetim (Rêveberiya awarte), saet: 18.00

LI NÇM'ya İzmirê

● 6.04.97 Yekşem: Konsera Koma Muzîkê ya NÇM'ê, saet:18.00

● 9.04.97 Çarşem: Panel, li ser 'Şer û Aştî' - Kamber Çolak, Fethî

Demir, saet:18.30

● 11.04.97 În: Konsera Koma Agirê Jiyan "Şeva piştigiraya xwendevanan", saet:18.00

● 12.04.97 Şemf: Konsera Koma Agirê Jiyan, saet: 18.00  
Kursiya Azad (NÇM İzmir)

● 9.04.97 Çarşem: Panel: 'Şer û Aştî' - Kamber Çolak, Fethî Demir, saet:18.30

LI BEKSAV'ê

● 6.04.97 Yekşem: Aliyên xweser ên ramana diyalektîk (7) "Devletin ortaya çıkışı ve yapısal biçimleri (Peydabûna dewletê û şeweyên wê yên avadanî)" - Hüsnü Aksoy, saet:15.30

## AWIR

# Ji bo zarokên xwe li hemberî **Îşkenceyê bêdeng nemîn**



**D**i roja 18' adarê de li Komeleya Bijîşkan a Edeneyê bi rêxistina Weqfa Mafên Mirovan (TIHV) panelek bi navê "Ji bo têkoşîna li dijî îşkenceyê, azîn (metod) û pêşniyar" hate lidarxistin.

Rêvebirê panelê, Sekreterê Giştî yê TIHV'ê Selim Ölçer bi îstatîstîkên ji 1991'ê bi vir ve, maxdûrên îşkenceyê li Tirkîyeyê û hejmara kesên ku serî li TIHV'ê dane gotina xwe vekir û got ku ji sala 1990'î heya niha 4662 kesan îşkence dîtîye û ji van 2600 kes hatine tedawîkirin.

Ji TIHV ya İzmirê Türkcan Baykal got: "Divê hemû civak di têkoşîna li dijî îşkenceyê pêjînkir bin." û da zanîn ku jêderka ve pirsgirêkê 'Susurluk'ê. Baykal diyar kir ku ji bo eşkerabûna îşkenceyê, divê em bikin ku îşkence neyê înkarkirin û ji bo zarokên xwe divê em bêdengiya xwe ya li dijî îşkenceyê xera bikin. Türkcan Baykal diyar kir ku peyitandina (ispat) îşkenceyê wê bibe gava yekemîn a 'şerê hikûkî' û bal kişand ve xalê ku ji layê komên hiqûqî û yên azad ve amadekirina raporên adli tipê, wê ji bo rakirina îşkenceyê bibe gaweke girîng.

Ji rêvebirê Komeleya bijîşkan ya Edeneyê Dr. Cavit Olgun jî bal kişand ser tîkiliyên doktor û îşkencexwaran û got: "Em textor bûn şahidê ve yekê; însanên ku îşkence xwarine ji gelek aliyên ve nikarin bibin wekî berê, gava em bi însanan re diaxivin, em ferq dikin ku em ji hev û du re bûne biyan (xerîb bûne).

Serokê Giştî yê ÇHD'ê Şanal Saruhan jî wisa got:

daxuyaniyên serokên (şef) polîsan ên bi rengê "Di bin çav de îşkence tê kirin" û axaftina Kenan Eyren ku gotibû "li Tirkîyeyê % 0.17 îşkence heye", îtirafên hebûna îşkenceyê ne. Lê gava çapemeniyê nivîsî, qîrîn ji wan hat.

Saruhan got: "Hemû rojên di bin çav de îşkence tê kirin, her du rojên pêşîn îşkence tê kirin, ji wir pê de ji bo ku birîn rihet bibin, wan di bin çav de dihêlin. Ji ber vê yekê pêwîst e binçavkirin bi temamî ji holê rabe." Prof. Saruhan axaftina xwe wiha qedand: "AİHK'ê biryar da ku ne tenê li OHAL'ê, li hemû herêmên Tirkîyeyê, darêz (yargî) ne serbixwe ye û sistema huqûqî naxebite. Komîteya rêlibergirtina îşkenceyê ya Ewrûpayê di dîroka xwe de yekemîn car di 1992'yan de dewleteke ku îşkencê dike, deklere kir. Dîsa eynî komîteyê di sala 1996'an de yekemîn car gava duduyan avêt û Tirkîye tawanbar kir.

Ji axaftvanan Prof. Semih Gemalmaz jî di axaftina xwe de wiha got: "Li Tirkîyeyê bingeha pergala (sîstem) huqûqî ji aliyê rejîma '12 rezberê ve hatine danîn û di sala 1997'an de jî eynî pergal dom dike. Serokê Konseya Tedawîkirina Mexdûrên Îşkenceyê ya Navnetewî (İRCT) İnge Genefke jî di axaftina xwe de got: "Îşkence kirineke li dijî demokrasîyê ye" û li ser tedawiya îşkenceyê, pêdiviyên xebatên navendên tedawiye hinek agahî dan.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

## TÎŞK

ŞÜKRÜ GÜLMÜŞ



Newroza  
Mazlûman

**N**ewroz, ne tenê cejna kurd û kurdistanîyan e, cejna hemû gelên Rojhilata Navîn e. Gelên herêmê bi serekiya Kawayê Hesinkar û bi pêşkêşiya Keyaxaris, li hemberî hikûmdariya Dehaq û asûriyan şerdanîn. Kawa, bi Keyhûsrewê Îranî re tekilî danî. Yekîti ava kir. Kawayê Hesinkar bi çakûçê xwe serê Dehaq perçiqand, piştî wê yekê hikûmdariya asûriyan felîşî.

Newroz, heta 1982'an tenê bi nav dihat zanîn; stran, dîlan, agirê serê çiyân.. Cejna Kuran bû, lê belê nava wê vala bû. Pûç bû. Ger mirov zanibe Newroz nû bûne. Newroz serhildan û berxwedan e. Miletêkî bindest, gelekî mazlûm, welatekî di bin potînen çar dijminan da, wê çawa Newroza wî azad û serfiraz bibe. Ger mirov xwe nexapîne. Jîna birdest ne jîn e, evîna bêjiyan ne evîn e.

Em, radibin û rûdin; tim û tim dibêjin Mazlûm!.. Kawayê Hemdem!. Çima? Bo çi mazlûm? bo çi Kawayê Hemdem? Çi wextî, di çi rewşê de Mazlûm çalakiya xwe danîbû holê. Ger em li ser van bifikirin wê wextê mezinatîya Mazlûm dê bê fêmkirin. Ew gotinên pûç, vala, ên ku ji serê zingarî derketine wê belav bibin.

Zîndana Amed, ji bo şoreşgerên Kurdistanê hatibû amadekirin, wekî goristanê bû. Şoreşgeran li berxwedan, ketin rojiya mirinê.

Dijmin soz da. Piştê soza xwe daqurtand. Dewra "teslîmbûnê" dest pê kir. Decalê mezin, Esat Oktay Yıldırım; mîna Dehaq saet bi saet, roj bi roj serê şoreşgeran dixwest. Pir tirsonek xistibûn dafika xwe.

Mazlûm got li hemberî her zalimî mazlûmek ger rabe; divê li her tîranî xencerek bê kişandin. Mazlûm şewa 20'ê adarê, sê niftikên xwe pêxistin. Ji heval û hogirê xwe re nîşan da. Rêça serxwebûn û azadiyê danî. Mazlûm wê jîyanên nû bi xwe re bîne.



## HEYA

bi roja Leyletulqedrê jî Koçer ji bavê Gulbarînê û ji malbata wê hez nedikir. Sedem jî bizina kol bû. Êşa ku bizina kol berdabû dilê bavê Gulbarînê, êşeke giran bû. Sewala bêyom her tim diçû bi çeperên derdora hewşa bavê Koçer xwe dixurand, bavê Koçer jî radihişte martagê û êrişî deriyê bavê Gulbarînê dikir. Bavê Gulbarînê jî keysa xwe li bavê Koçer anîbû. Her çiqas ew dihat hetanî ber derî jî, lê dema bavê Gulbarînê radihişt tevşo, bavê Koçer heya ber deriyê mala xwe dibezîya. Ji ber vê yekê navê bavê Koçer derketibû, bizdonek.

Tevşo, ruhstîne bavê Koçer bû. Wexta bavê Koçer zarok bûye, ew û mamê xwe çûne çeperên çilo, li wir çavên bavê Koçer bi marekî mezin ketiye, ji nişka ve qîriyaye. Bi zivîrîna bavê Koçer re mamê wî tevşo li destê xwe daye û du pêçiyên wî firiyane. Ji wê rojê şûn de tîrsa tevşo ketiye dilê bavê Koçer.

Heya roja Leyletulqedrê Koçer rojê deh caran Gulbarîn didît, lê dilê wî li wê germ nedibû. Gulbarîn keçikeye pir rind bû. Her kesî bi tiliyan ew nişanî hev dîdan. Ji bo Koçer ew qîza dijminê bavê wî bû.

Xortan tevan kateyên bi xwê û biçûk amade kiribûn. Kateyên xwe datanîn ser çeperên darên biyan û li ser banan temaşê dikirin. Qijikeke belek kateya Koçer hilda û li ber deriyê mala bavê Gulbarînê danî. Koçer di cihê xwe de sar bû, wekî di rojên çile de be, dev û lêv li wî reş bûn. Bi bêhneke teng û silikî ji hevalên xwe veqetiya.

Koçer, ji ber dudîliya xwe roj bi roj diheliya. Navê wî û yê Gulbarînê di gund de belav bûbû. Di dawî de Koçer biryara xwe da, wê bi Gulbarînê re bizewiciya, lê bavê wî!.. Bavê xwe jî wiha anîbû ser rê: "Ez dê bi wê re bizewicim da heyf û tola te ji wan hildim."

Çawa tîrsa tevşo ketibû dilê bavê Koçer, wisa jî tîrsa dijminatîyê ketibû dilê Gulbarînê; ku yek bihata kuştin wê mala her du aliyan jî xira bibûya. Wê jî dixwest bi Koçer re bizewice.

Koçer û Gulbarîn zewicîn. Ne qelen, ne zêr, ne jî cihêz hebû. Roj û meh derbas bûn. Çav û guhên bavê Koçer li mal û jiyana wan bû. Koçer di malamatê de mabû. Êvarekê belasebeb şiva ter hilda û li Gulbarînê da. Qêrîna Gulbarînê erd û ezman dihejand. Ew qêrîn, di guhê bavê Koçer de dibûn straneke sivikî.

Koçer xwe li bavê xwe girtibû. Êdî kêfa wî bi şol û mijûlahiyên Gulbarînê nedihat. Bi rastî ew û Gulbarîn li ber çavên hev û du reş bûbûn. Rewşa wan a aborî jî gelek nebaş bû. Koçer li çareyekê digeriya. Rojekê kir serê xwe ku here Stanbolê da ji bin baskê bavê xwe derkeve. Fikra xwe ji Gulbarînê re jî got. Çav li Gulbarînê fireh bûn, bû tepetepa dilê wê. Li derdora xwe nihêrî ku rot (rewt) an jî şiv nîn e, li alî derî rûnişt û gotê:

– Bes e êdî, ji destê bavê te emê he-

ya kîjan deverê baz bidin, ên xelkê malên wan têne şewitandin, dibin zevt û zora dewletê de ne, ji neçariyê koç di-kin, lê ez û tu?

– Heyî, heyî!

– Ne heyî û ne jî tu tişt.. Min xwe kir qurban ji bo te, ji bo bavê te û ji bo bavê xwe. Ez ne qûça sebrê me.. Her roj ji ber lédana te laşê min ji qetranê wêdetir dibe, ma tu xwedayê min î?

– Hêdî...

– Na, ne hêdî. Heger qêrîna min dilê bavê te xweş dike, ezê her şev biqîrim. Her kêmaniyên te li ser çavan, lê ez terka vî gundî nakim. Încax meytê (termê) min dihere.

– Qîza nizamî çî, nan tune ye, şewate tune ye, ard tune ye, pez tune ye, erd tune ye...

– Li Stanbolê van tiştinan dibarin? Her tişt jî heye. Xelk di sê çar rojan de du erebe gûniyan tînin. Ji me re çar bizinan bistîne besî me ye. Ez li malê xwedî derdikevim.

– Tewlo, me bi bizinekê re serî kişand, vêca emê bi çar bizinan re serî bi kişînin...

– Tu jî dizanî ku êş, ne êşa bizinê bû.

Li aliyekî li ser navê mêraniyê Koçer bêtebat bû, li hêla din jî gotinên Gulbarînê li xweşiya wî diçûn. Li gorî Koçer tu kesî bavê xwe neavêtibû ku wî jî biavêta. Jina wî dixwest Koçer xwe li rastiye bigire. Koçer jî ji kesên ku çûbûn welatan û vegêriyabûn bihîstibû ku terka welat ne xilasiya êşan bû.

Çend roj derbas bûbûn, Koçer şeş bizin kirin. Cîranê wî erebeya hespan daye, çû du erebe gûnî jî anîn. Ji hewşa bavê xwe re jî çiloyê berûyan anî. Wê salê bi nemirî derbas kirin.

Her çiqas Gulbarînê dixebitî jî, di jiyana wê de gul venedibûn. Koçer carê ji baxçeyê hezkirinê derketibû. Her çiqas diperpitî jî bi ser nediket. Bavê wî hişê xwe winda kiribû. Dayika wî bûbû bavê wî, birayê wî jî bi dergistî bû.

Koçer heyranê jîrekî û jêhatîbûna jînika xwe bû. Wî bi xwe dizanî ku piçek wêrekî pê re tune ye. Tu carî nedixwest bi kesekî re pev biçûya. Beriya têkoşîna rizgariyê bi polîsan re têtikiliyên wî

hebûn. Dixwest ku bi saya polîsan kes têtikilî wî nebe. Çend salên şer qediyên, ew jî ji polîsan dûr ket, nedixwest navê ajantîyê bi dûv wî bikeve.

Wê salê yekî ajan ji hêla şervanan ve hatibû kuştin. Tirseke bêhempa ketibû dilê Koçer. Her gavê, her çirkê kezava (kezeb) Gulbarînê jî reş dikir:

– Keçê xeberê bide lawê mamê xwe. Ew heval e. Ma ez ne mêrê te me? Tu jî dizanî ku ez alî tu kesî nakim.

– Tu aliyê xwî û adetên bavê xwe yî. Bêhişo, ew ne lawê mamê min e. Ew êdî lawên rastiyan e. Heger te tu tiştên xerab nekiribin, ji bo çî tu ditirsî?

Koçer, di hişê xwe de qereqoleke



# Gul Gulbarîn

dojehî avakiribû. Bi jina xwe jî ne ewle bû. Bihîstibû ku yên alî hevêlan bikin li berjewendiyên malbatî nanihêrin. Bavê wan jî be, ji rastiye dûr nakevin. Polîsan ew tirsandibûn. Rojekê jî bi dilekî xweş nedijîya. Ji wî werê bû ku civak tev basa wî dikin. Baweriya wî bi tu tiştî, bi tu kesî nemabû. Heger xirakirina cîhanê di destên wî de bûya, di yek çirkê de wê cîhan xera bikira.

Ji bo kirya riya xwe dirav deyn kirin û çû Fransayê. Demeke dirêj di ser çûna wî re hîn derbas nebûbû, gundiyan bihîst ku Koçer nexweş ketiye û du mehan di nexweşxaneyê de razaye.

Ê ku wî dîtibû, Eyûbê Kurmaxwar nedîtibû. Li Fransayê yekî gotibû ku;

"Koçer ajan e. Ji bo ajantîyê polîsan dirav dane wî." Koçer li wê derê jî ketibû derdê mirinê. Ji neçariya xwe vegeriya gund, xwe li bêhişiyê danîbû. Ji bin baskê ciwanan dernediket. Piştî demekê dît ku di civakê de tu kes wî bi qas kermêşekê jî nahesibîne. Hêdî hêdî bixwe ve dihat.


Dayika Koçer miribû. Birayê wî zewicibû, li bavê xwe jî dinihêrî. Gulbarînê jî şeş bizinên xwe kiribûn çardeh bizin. Êdî dema ku Koçer digot: "Gulbarîn", bi hezaran Gulbarîn ji dev dibarîn. Gulbarîn di malbatê de hem jî hem jî mêr bû.

CÎHAN ROJ



# Hejmara nû ya Nûbiharê derket

Kovara çandî, hunerî û edebî Nûbihar bi hejmara xwe ya 49'an derket pêşberî xwendevanên xwe. Di vê hejmarê de sergotar li ser mijara "Netew û netewperestî" ye. Ali Karadeniz di vê nivîsê de li ser taybetî û girîngiya netewetiyê radiweste. Li gorî dîtina wî li aliyekî mirovahi ber bir yekîtîyekê diçe, li aliyê din ji ber se-



demên siyasî şnor li derdora neteweyan tene tengkirin. Nivîskar Karadeniz dide zanîn ku neteweperwerî pêwîst e, lê neteweperestî tiştêkî çewt e. Her wiha di vê hejmarê de nivîsa Zeynelabîdîn Zinar a li ser peyvên kurdî ku derbasî erebî bûne, gelekî balkêş e. Dîsa hevpeyvîna Süleyman Çevik digel Ahmet Aras kiriye, heja ye.

Di vê hejmarê de ji bilî helbesta Ömer Faruk Çetinkaplan a bi navê "Homa rê ak qelbê xwu" hemû nivîs bi kurmancî ne. Bi tenê ew helbest bi kirdkî (dimilî) ye.

# Di Nûdemê de çarsedsaliya Şerefnameyê

**Ji ber ku îsal çarsedsaliya nivîsandina Şerefnameyê ye, li ser wê Ziya Avcî çend gotar li kurdî wergerandine. Bi van gotaran mirov dibe xwediyê nêrîn û agahiyên pêwîst ên der barê Şerefnameyê de.**

Hejmara 21'ê ya kovara Nûdemê derket. Di vê hejmarê de bi giranî li ser du mijaran hatiye rawestîn. Ji ber ku îsal çarsedsaliya nivîsandina Şerefnameyê ye, li ser wê Ziya Avcî çend gotar li kurdî wergerandine. Ev nivîs ji pêşgotinên Şerefhanê Bedlîsî, E. Hejar (a ji bo wergera kurdî), Mihemed Elî Ewnî (ji bo çapa erebî) û gotara F. Vilyaminov Zimov ku ew jî pêşgotina çapa fransî ye pêk hatiye. Bi xwendina van gotaran mirov dibe xwediyê nêrîn û agahiyên pêwîst ên der barê Şerefnameyê de. Amadekarên kovarê bi van nivîsan sûdeke baş gihandine gencîneya çanda kurdî. Di serî de nivîsa E. Hejar, hemû nivîs di warê dîroknasiya kurdî de asoya mirov berfireh dikin.

Divê em li ser wergerê jî çend tiştan bibêjin. Ziya Avcî kedeke heja daye vê xebatê, lê çewtîyên di warê rêzimanî de dilê mirov ji xwendinê sar dike. Avcî bi berdevamî navdêr xelet tewandine û cînavkên xelet bi kar anîne.

Mijara duyemîn a ku di vê hejmarê de bi giranî li ser hatiye rawestîn, stranên gelêrî û dengbêjî ye. Li ser mijarê Sidqî Hîrorî bi navê "Stîrana berxwedanê" bi taybetî li ser stranên Tahsîn Taha rawestiyaye. Her wiha Süleyman Demir bi navê "Ji bo giramiya Mirado" nivîseke

balkêş li ser Miradoyê dengbêj nivîsiye. Dîsa Şerefhan Cizîrî bi "Bûyer, huner û hunermend" analîzeke civakî û siyasî li ser bûyera di stranekê de dike. Di vê analîzê de ew cihê stranbêj di civakê de, têkiliya wî bi serdestan re û nirxên civakî yê wê demê jî tîne ziman. Di nivîsê de tesbîteke balkêş li ser mîrekî feodal heye. Şerefhan Cizîrî dibêje ku zalimiya mîrên feodal li gorî nirxên serdemê tiştêkî asayî ye. Lê îro li ser rûyê cihanê gelek siyasetyan hene ku li ser demokrasiyê zilimkariyê dikin.

Digel van her du mijaran, gelek nivîsên cihêreng di vê hejmarê de cih digirin. Her wekî helbestên Rojen Barnas, Mehmet Aktaş, Arjen Arî û Mustafa Aladağ, lêkolîneke Fawaz Husên li ser Cornille û Racine, çîrokeke Mihemed Dehşîwar, nivîseke lêkolînî ya Rohat Alakom bi navê "Keşkirina



kurdan ya Amerîkayê" û hwd. Di nava van nivîsan de çîroka Mihemed Dehşîwar balkêş e. Çimkî ew li ser jiyana malbateke amedî ya piştî şoreşa Kurdistanê ye.

Di encamê de mirov dikare bibêje ku ev hejmara kovarê jî ji aliyê naverokê ve mişt e. Kovara Nûdem li Swêdê sê mehan carekê tê weşandin. Hemû nivîsên di kovarê de bi zaravayê kurmancî ne.

Navnîşana xwestinê  
Termov. 52 2tr.  
17677 Jarfalla-Sweden  
Tel û faks: 8-58356468

SERWISAE ÇANDÊ

## Gelî zindaniyan Newroza we pîroz be!

JAN DOST



Newroz hat, erê ew mêvanê her sal e, lê dîsa jî li ba me kurdan ew giran û biqedr e. Dî rojên xweş de tê, berî ku were jî, me haydar dike, di pêş xwe de gul û nesrînan, kulîlkan, beybûnan ji me re rê dike, xwezayê dixemilîne. Tîne dixê rojê.. Çivîk û dûmeqesan bi ezmanê şîn dixê. Hêviyên me yên razayî hişyar dike, dilên westiyayî, ger dike û kenê şîrîn li ser lêvên keç û xortan dineqîşîne.

Erê.. em kêfxweş in di Newrozê de,

jiyaneke nû ye, bihar e. Em tê de ji bêhna xweş serxweş dibin.. Belê di vê serxweşiyê de em xelkên xwe yên di zindanan de ji bîr nakin..

Ewên ku di kûraniya zindanan tarî de rûniştine, destên wan li ser kabokên birîndar û pişt wan li dîwarên sar û çavên xwe bi xewneke xweş dane ser hev.

Ev-kesên ku ji bo em bikenin ew dinalin. Ji bo em xeweke xweş bikin, ew xewê ji bîr-dikin, ji bo lingê me bi xurtî û bêtîrs li ser xaka welatê me bimeşin, xwe li ber şewata şivên berûyan û qamçiyên celadan radigirin. Ew in yên ku nivê temenê xwe û xortaniya xwe ev de kirine qurbanek ji bo ku em di jiyanê xweş de bigerin..

Taştiya wan pehîn û derbên xêzeranê ne, navroja wan riswakirina cendirme û

celadan e, şîva wan qîrîna ji ber wanên xedar e û xewnên wan azadiya.....

Vê Newrozê.. ew tene bîra min, lê wekî nivîskarekî ezê çî bikim, tenê ev rûpelên spî li ber min hene, tenê ev meydana teng li ber hespê xeyalan vekirî ye. Tenê ev pira hezhizî min digîhîne kenarê armancan û ez dibêjim an jî bi destêkî lerizî dinvîsim:

Gelî zindaniyan, ey siwarên êşê, ey mûm û şemalên ku deqe bi deqe tariyê dorpeç dikin û xelean lê teng dikin, ey kesên ku bi dîlbûna xwe azadiya çiyayên xwe diparêzin ez Newroza we pîroz dikim. Ey çiyayên di zindanê de, ey stêrkên di pişt ewrên giran de, ey tuxmên azadiyê yên di binê zeviyê de. Me hûn ji bîr nekirine û berî ku hûn di zindanan de bin, hûn di dilê me de ne. Dîsa Newroza we pîroz be.



# Asena, neke van gotinên erzan

**W**ezîra Karê Hundirîn Meral Akşenera ku ji aliyê derdorên faşîst ve wekî 'Asena' ango çêlegur tê binavkirin, hefteya çûyî di vekirina Qereqola Kağıthaneya Stenbolê de, ji bo Serokê Giştî yê PKK'ê dest bi heqaretan kiriye.

Faşîstên tirk dema yek ji nîrxên wan ên neteweyî re tiştêkî nebaş dibêje, dîn û har dibin, lê bi xwe bi hêsanî heqaretê li nîrxên neteweyî yê gelan dikin. Heke yek dijminê mirov be jî, dema mirov bi çêran biçê, ew kirêtiya mirov nîşan dide. Tê zanîn ku kurd hurmetê nîşanî dijminên xwe jî didin, dema dijminên wan dilêr û camêr bin vê yekê bi dilekî vekirî dibêjin. Lê mixabin dêlegur û çêlegurên tirk ji vî alî ve jî dûrî pîyanên li gorî daxwazê ne.

Hin rojan di hemû kanalên televîzyonên tirk de filmên ku pesnê şovenîzmê didin, derdikevin. Di van filman, yekî de leşkerên tirk êrîş dibin ser baregehêkî yewnanan, serlistikvanê film yekî yewnanî dîkuje, li wir ala yewnanî bi ber çavên wî dikeve, pêhna xwe lê dide û dibêje: "Wekî we, ala we jî naşibe tu gûyî?", lê dema yekî yewnanî ji ala wan re tiştêkî wisa bibêje, wê dîn û har bibin. Dema di Kongreya Du-



Dema ez ev qas bûm, ji min re digotin: Asena

HADEP'ê de çend kasan ala tirk danîn kin. Lê gelê kurd vê yekê napejirîne û xwarê faşîstên tirkan qiyamet rakirin, kesên ku ji nîrxên wan ên neteweyî re

lê bi xwe ala kurdi wekî paçikekî bi nav dikin û li serokê partiyeke kurd ku ji aliyê bi miliyanon kurd ve wekî serokê neteweyî tê binavkirin heqaretê dikin. e.

Siyasetvanên tirk di vî warî de gelekî bêserûber in, belkî ji hedê bav û bapîrên xwe jî der in. Rast e, şeweyê karkirina wan bi vî rengî ye, ji hev û din re jî her cure dijûnan dikin, paşê jî tîr bi hev re kar di-

dide çêr û dijûnan jî ji bîr nake. Kesên wekî Akşenerê bi van gotinên xwe to- vên dijminatîyê di navbera gelan de di- çînin. Ez jî dixwazim li ser vê darîtina Asenayê, helbestekê darêjim.

*Şalyara navxweyî  
Çêlegura nûzayî  
Di vî kari de hê tu nû yî  
Bêhn ji te hat şêva çûyî  
Asta xwe neke kortal,  
Bi vî rengî neke galegal  
Mirov ji dijminê xwe re jî nake çêran  
Çêrfiroş ne li mizgeftê tîr, ne jî  
li dêran*

*Li bêndera rêxê, neke gêre  
Di aşê xwe de sergînan nehêre  
Ey berpirsa asayîşê  
Bi gelê kurd re nekişîne qayîşê  
Di vî kari de bi ser neket dêlegur  
Tu car bi sernakeve çêlegur  
Gotinên wisa ji sinor der in  
Hêjayî devê ker in  
Devê xwe neke misînê teharete  
Li kesî neke heqaretê  
Asena, heqaret karekî hêsan e  
Lê toqa stûyê pisê pisan e.  
Bi çêrfiroşî û faşîti  
Tu car pêk nayê aşti  
QELEMŞORÊ SÎNORNAŞ*

## BIXELAT...

N	S	N	O	D						
Z	E	K	Î	Y	E	A	L	K	A	N
W	E	L	A	T	D	U	R	Û		
A	R	T	E	Ş	L	A	L	E	Ş	
O	H	I	M	Û	R	A	B	Î		
A	Z	Â	M	A	L	V	Î	N		
N	Î	R	S	E	G					
Y	A	D	E	Ş	T	E				
M	A	Ş	A	Î	N					
X	E	T	H	Ö	R	Î				

PEYVA VEŞARÎ → LORİSTAN

## Bersiva Xaçepirsa 60'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 62'an pirtûka HEINRICH BÖLL "Şerefa Wendabûyî ya Katharina Blum" e

**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we-bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.



Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 60'an, kasetê Koma Amed "Dergûş" qezenc kirine: Talat Dayan/Sêrt, Hasan Savaş/Tokat, Nuray Hatun/Malatya, Salman Timur/Bartın, Necmettin Kortak/Edene

## XAÇEPIRSA BIXELAT (62)


## XAÇEPIRSA

Teyrek	Salveger, biranin	Bajarekî Rojhilatê Kurdistan	Meraq	Nefes	Xuya- eşkere
Serokkom arê Mihabadê	Mücid		Ali, lay, teref	Eşîreke kurd	3
		8			
Zîman, axaftin- Gihanek- ek		Aramî, nermayî Baneşan- ek	6		
	Dol, wadi			Ali, hêl	
	Sehpa, qenare	2		Îtriyûm	
Xêr, qenci Li ser benderan tê kirin			Qanûn		
			Bîzava gelêrî		
		Hêrangeh		Dîji her	9
		Lêkera dîji birinê		Biyan, xerîb	
Kalîn, nalandîn	Elementek				
	Pêxember ek				
7			Xwedayekî Misrî		
			Notayek		
Dêm, sima		Bihîşt, cennet	4		
Fosfor					
	Term, cenaze				1



PEYVA VEŞARÎ → 1 2 3 4 5 6 7 8 9





## Serokê belediya Wanê lêdan xwar

Di roja 28 adarê, saet di navbera 12-01'ê de, bi fermana Serokê Belediyeya Wanê Aydin Talay, polîs û zabîten belediyê erebokên sêteker ên firoşkarên gerok ji kolan û ber deriyan bi bédengî kom kirine û birine li derveyî bajêrewitandine. Li ser vê yekê firoşkarên gerok serê sibê (29-3-1997) li ber belediyê kom dibin û daxwaza erebokên xwe dikin. Her di vê rojê de ji layê R.P.ê ve ji ber ku bi gel re roja piştgiriyê' dihate kirin, 4 derhûd (mêbûs) ên Wanê jî li belediyê amade bûn. Li ser daxwaza firoşkarên gerok derhûdê Wanê Mustafa Bayram, ji serokê belediyê daxwaza çareseriyê bi şeweyekî aştiyane dike, lê Aydin Talay bi gef û fortan bersiva wî dide. Li ser vê kirina nexweş ya Aydin Talay, Mustafa Bayram hêrs dibe û her du pev diçin.

Li aliye din cerdevanek bi navê Vezir Baycan (50) li Wanê di binçav de hate kuştin. Li gorî daxyaniya polîsan ew bi 13 kilo báz morfin hatye girtin û întixar kiriye. Lê malbata wî dide zanîn ku ew bi îşkenceyê hatiye kuştin.

ELBAKÎ-WAN

## Şanogeriya Cîhanê û demokrasiya tirkî!

Her wekî tê zanîn ku 27'ê adarê roja pîrozkirina şanogeriya cîhanê bû. Ev roj, ji bilî hinek deverên Afrîkayê li seranserê cîhanê bi berfirehî û li tirkî jî wekî xwe hate pîrozkirin.

Dewleta tirkî ku bi kuştin û windakirina mirôvan navdar e, di vê roja diyar û hunerî de jî ev yek berdewam bû, li ser dirindeyî û kirinên xwe yê nemirovane. Hêzên dewletê êrîşî ser her du şaxên NÇM'a Edene û Mersînê kirine. Di encama vê êrîşa dirindane de digel du karbidest û gelek endaman û mêvanên her du şaxên NÇM'ê hatine girtin. Ji layê gelek sazî, komel û rêxistinên cemawerî û demokratîk ve bi daxuyaniyeke çapemeniyê hate ragihandin ku di roja pîrozkirinê şanogeriya cîhanê de ew vê êrîşê şermezar dikin.

Xebatkarê Navenda Çanda Mezopotmyayê bi daxuyaniyekê ev rûdana kirêt bi tundî protesto kirin û daxwaza azadkirina hevalên xwe yê ku di her du şaxên NÇM'ê de hatine girtin, kirin.

## Veşyayin Ewrûpa û Tirkiye

Verdê çend rojan sûka Holanda Lahey de û sûka Almanya Krefeld de keyeyê kurdan veşyay û 9 kurdî mardî.

Na veşyayin ser sermayananê dewleta tirk vat: "Nijatperestananê Holanda û Almanya tirkê ma veşnay.", nê dewletî û şexsê înan de hemû Ewrûpa protesto kerdî.

Bêguman tevawo winaynîn kotî dê dinyay de bibo, gerek her kes nînan protesto bikro. La belê dewleta tirk jû kişt ra mardiman veşnena, kişt bîn ra pretesto kena. Hewna vizêr, Sêwaz de 37, Basa de 11 mardimê kurdî veşnay.

Bewnê ekê veşayê tirkî niyê, kurdê û hem jî gorey vatenandê cîranan dê nînan, nê mardimî welatperwer ê.

Ze ke şima jî zanê, dewletanê ewrûpî nêwazanê Tirkiye bigirê miyanê Jûwîna Ewrûpa, iyê wazanê Tirkiye mesela kurdan û mafê mardiman hel bikrê.

Nika dewleta tirk wazana ebi jû sîde di mîçikî bikşo. Jû kişt ra vengê dewletan de Ewrûpa bibirno. Înan ra vajo: "Şima de jî îhlalê mafê mardiman estê." Kişt bîn ra jî şerê limînî bikirêşo Ewrûpa û serê hûnerandê xo racenq. Torinandê Kor Misto ra bê qetîaman teva nêpawiyeno.

aloz: tevlihev (karmaşık)  
bac: qamcor, mûçe (vergi)  
bêyom: bêoxir, bêşans,  
berjewendî: menfeat (çıkâr)  
binemal: malbat (aîle)  
bizdonek: tirsonek, nêwêrek (korkak)  
cure: celeb, çeşit  
çavkanî: jêderk, kan (kaynak)  
çîçirk: neviyê neviyan  
derhûd: nimîner  
digel: ligel, tev (birlikte)  
dîl: hêsîr (esir)  
dîtir: yê din (öteki)  
firoşkar: satıcı  
gencîne: xezîne  
gewre: mezin  
hêja: hê, hîn

## Ferhengok

hêkîç: lîstika bi hêkê  
hêvişandin: mûhafazakirin  
kat: dem  
kelat: kela  
kerb: keder  
keys: delîve, firsend  
kiryar: bikir (alıcı)  
kujer: bikuj, qatîl  
martag: mertek  
milûsbûn: melisîn (sinmek)  
naverok: muhtewa, içerik  
navbirî: tiştê ku berê qalê bûyî  
nehênî: veşarî (gizli)  
nevîçirk: çîçirk  
nûjen: modern

nima: îmge  
nîgaşî: xeyalî  
qesr: qonax  
qonax: merhale  
pejirandin: qebûlkirin,  
pêvajo: sûreç  
pêşniyaz: pêşniyar  
pûtepêkirin: cidîgirtin, (kaale almak)  
rêxistin: örgüt  
ruhstîn: azraîl  
terxankirin: veqetandin (ji tiştêkî taybet)  
tundraw: radikal  
sirûd: marş  
şiyar: karîn, kanîn  
şîlf: tazî  
şûnûwar: cih  
zêmar: stranên şîne

**WELAT**

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayınçılık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖYLER

NAVNİŞAN  
Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX  
(0 212)  
251 90 13

Gerîndeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên  
Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziye  
(Müessese Müdürü)  
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.

BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)  
Nimîndeyê Giştî  
yê Ewrûpayê:

M. Rojava  
Suriye: Jan Dost  
Helim Yûsiv  
Berlin:  
Silêman Sîdo  
49-30-69002695

Hannover:  
Selim Biçûk  
49-5721-81360

Munchen:  
Mahmut Gergerli  
49-871-670884

Bruksel:  
Medenî Ferho  
32-02-466037  
Stockholm:  
Robîn Rewşen  
46-8-7510564

Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

Celle:  
Wezir Saçık  
49 50 52 87 36



# Televîzyona gelê bêdewlet: MED-TV

Gelê kurd piştî ku li hemberî dagirkeran rabû ser piyan, çî tiştê ku jê re pêwîst bû, bi destê xwe ava kir.

Ew li hêviya dagirkeran nema û wekî tekane gelê bêdewlet ku xwediyê televîzyona ku bi peykê weşanê dike, navê xwe xist dîroka mirovahiyê. Televîzyona kurdî MED-TV digel êrîşên dagirkeran kete sala xwe ya sisiyan.

Di destpêka sala 1995'an de di nav kurdan de navê televîzyoneke ku wê bi zimanê kurdî weşanê bike, hate bilêvkirin. Pir kesan baweriya xwe bi van gotinan nedianî, digotin: 'Ma çawa dibe, wê kî bikare veke', her wiha hin kesan jî didan zanîn ku ger televîzyoneke ku bi zimanê kurdî weşanê bike bê avakirin wê bi piştgiriya dewletên ewrûpî be. Ev gotin roj bi roj belav bûn û roja 30'yê adara 1995'an her tişt kifş bû û televîzyoneke bi zimanê kurdî MED-TV'yê dest bi weşanê kir. Lê ne bi piştgiriya dewletên ewrûpî û biyan, hem xebatkarên kurd bûn, hem jî avakarên kurd bûn.

Di destpêkê de rojê seatekê weşan kir, di 15'ê gulana 1995'an weşana MED-TV'yê bû 5 seat. Di 1'ê kewçêra 1995'an de jî weşana televîzyonê bû 6 seat.

Dewleta tirk ji roja avabûna MED-TV'yê pê ve li Ewrûpayê dest bi çalakiyên ji bo girtina wê kir. Li gorî zagonên dewleta îngilîz ev televîzyon qanûnî bû, girtina wê ew qas hêsan nebû. Lê pişt re rûyê rastîn yê dewletên ewrûpî jî derkete holê.

Dewleta tirk êrîşa xwe ya yekemîn di 15'ê berfanbara 1995'an de li hemberî MED-TV'yê pêk anî. Di 15'ê berfanbarê de Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan agirbest îlan dikir. Dewleta tirk bi milyaran pere da ji bo ku weşana MED-TV'yê qut bike sînyal şande peyka ku MED-TV pê weşanê dike. Êrîşa duyemîn jî di 2'yê tîrmeha

1996'an de kir. Şirketa Roj NV'ya MED-TV'yê peyman ku şirketa Têlekom a bi Polonyayê re çêkiribû dewleta tirk bi têkiliyên xwe yê politik ev peyman da îptalkirin û MED-TV 45 rojan weşan nekir. Televîzyonê di 15'ê gelawêja 1996'an de careke din û hem jî rojê 8 seat dest bi weşanê kir. Êrîşa sê yemîn jî di 18'ê kewçêra 1996'an de pêk hat. Ev êrîş bi organîzasyona dewleta tirk û jî aliyê cendirmeyên Belçîkayê û polîsên Îngîltereyê ve li cihê weşan û bûroya li Londonê pêk hat. Li gorî idiyaya wan xebatkarên MED-TV di bin navê televîzyonê

dinwîsandin û nûçeyên ku derdiketin ji bo bala dewletê bikişîne bi îstatîstîk û belge diweşandin. Wekî nivîseke ku di rojnameya YENI YÜZYILê de hate weşandin bala dikşandine ser girîngiya MED-TV'ê di warê netewebûna kurdan û girîngiya zimanê kurdî de. Her wiha di hin nûçeyan de jî dihate diyarkirin ku her roj bi dehan antênên peykê diçine Başûrê Kurdistanê û li Tirkiyeyê jî ji nişka ve hejmarê firotina antênên çanax zêde bûbû, ango çar televîzyonên li tevî

## Rekorên MED-TV'yê

Cara yekemîn e ku televîzyoneke bi sê zaravayên kurdî û bi zimanên tirkî, erebî, îngilîzî, suryanî weşanê dike, hate avakirin û taybetiya wê ya herî mezin jî ev bû: Ew ne televîzyoneke girêdayî dewletekê bû. Heta avabûna MED-TV'yê tu televîzyon li rûyê cihanê ji ber sedemên politik nehatibûn girtin. Li ser weşanên MED-TV'yê politikayên dewleta tirk û dewletên Ewrûpayê xera bûn.

Televîzyona ku li rûyê cihanê jî aliyê dewletan ve lê êrîş hate kirin jî dîsa MED-TV bû. Di destpêkê de bi 20 xebatkarên ku tecrûbeyên wan di warê weşanvaniya televîzyonê de tunebû dest pê kir û îro gihîste asteke bilind. Wekî tê zanîn piştî îcatkirina hin hacetên teknîkî cara yekemîn ceribandina wan jî tê kirin, ceribandina haceta ku peykan xera dike jî ji bo weşana MED-TV'yê hate bikaranîn ev tevî rekorên ku heta vê gavê tu televîzyonî nikaribûye bişikêne, MED-TV'yê şikand.

## Televîzyona herî demokrat

Her tim danûstandinên me bi rojnamevanên ewrûpî re çêdibe. Dêma ku em li ser MED-TV'yê pirsan ji wan dikin, bersiva yekemîn ev e MED-TV televîzyona herî demokratîk e. Û li rûyê cihanê belkî tekane televîzyona ku nayê sansûrkirin e.

Temaşevanên MED-TV'yê her roj zêde dibin. Her roj ji Kurdistanê telefonên ku ji me dixwazin firekansên MED-TV li ser weşanê dike hîn bibin, tîn û bi çanaxekê herî hindik sê-çar malbat li MED-TV'yê temaşe dikin. Ev jî vê rastiyê derdixîne holê ku tu kes nikare rê li ber televîzyona kurdan bigre. Li aliyê din daxwazeke gel jî heye ku televîzyonê wan rojê herî hindik 12 seatan weşan bike û programên bêhtir xurt bêne çêkirin. Ji ber rewşa aloz niha tu kes jî mafê rexnekirina televîzyonê di xwe de nabîne.

M. AKSOY



dekarê narkotîkê jî dikin

û pereyê narkotîkê bi vî awayî xerc dikin. Vê êrîşê jî weşana televîzyona kurdî neda sekinandin. Pişt re diyar bû ku kesên ku karê narkotîkê dikin rayedarên dewleta tirk bi xwe ne û ev yek jî ji aliyê dadgehên ewrûpî ve hate bilêvkirin.

Li ser MED-TV'yê di çapemeniya tirk de ji bilî êrîşan, hin nivîsên ku wekî îxbar jî derketin. Pir kesên ku

Tirkiyeyê weşan dikirin jî hebûn, lê ew qas çanax nehatibûn firotan. Ev yek ji bo dewletê tirk telûkeyek pir mezin bû. Dewlet di navbera du agirî de mabû, li aliyekî nikaribû li Ewrûpayê MED-TV'ê bigire, li aliyekî jî her roj temaşevan zêde dibûn û hejmarê malbatên ku li MED-TV'yê temaşe dikin li gorî lêkolînên dewleta tirk û Amerîkayê li Tirkiyeyê 2 milyon û li tevî dinyayê jî 50 milyon temaşevanên wê derketin hene, ev jî bo sala 1996'an. Ev dibû sedema bingehîn ku dewleta tirk êrîşî ser temaşevan û weşanê televîzyonê bike. Her wiha li bajarên Kurdistanê hêzên dewletê çanaxên kurdan dişikandin û dest datanîn ser çanaxan jî pirsgirêka dewleta tirk a pîsikolojîk çareser nedikir. Îcar bi biryara MGK'ê çareyeke din hate dîtin ku çanax li tevî Kurdistanê bêne qedexekirin û li cihê çanaxan ji bo dîtina formuleke ku tevî weşan di bin kontrola wan de bin, xebat dane destpêkirin.